

welat

Sal: 1 Hejmar: 11 2-8 Gulan 1992 3000 TL (KDVD) Rojnameya Hefteyi


Sedat Yurdaş:

'Hêzên dewletê mafê jînê ji holê radike'

Mebûsê Amedê Sedat Yurdaş, li ser bûyerên rojê dawî û ji bo şirovekirina van bûyeran di 28.4.1992 an de ji serokatîya meclisê re daxwaznameyek şand. Sedat Yurdaş, di vê nameya xwe de, hin pîsan dispêre wezîrê hundir İsmet Sezgin û dixwaze ku bersîva van pîsan bide.

Sedat Yurdaş, di daxwaznameya xwe de, wiha dibêje: "Hêzên dewletê di 18.4.1992 an de, li Bismilê Mikdat Kutlu digrin;

Rûpel 15



Gav bi gav ber
bi xelasbûnê ve

- Gelê Kurd Parlementoya xwe bi destênen xwe ava dikin. Di demeke nêzik de ji bo parlementoya neteweyî wê hilbijartîn çêbibe. Rûpel 15

Daxwiyanîya parlamenterê Kurd

- Mebûsên Kurd, siyaseta hikûmetê û hêzên dewletê yên li hemberî gelê Kurd bi şeweyleke hişk tewanber û protesto dikin. "Hêzên dewletê, di şadîmaniyyê Newrozê de 103 mirovîn Kurd kuştin."

Rûpel 15

Gel rûmet nade parlamenterên sixte

- 235 mirovîn welat-parêz bi hev re ji mebûsên SHP ê Abdulkârim Zilan, Fehmi Işıklar, Adnan Ekmen, Mahmut Ali-nak, Mahmut Uyanık û Salih Sümer re nameyeke eşkere rîkirin. Xwedîyê nameyê vê nameya xwe bi civîneke çapemeniyê ji raya gişî re diyar kirin.

Rûpel 15

Mirovî gelê xwe neparêze û lê nebe xwedî bila bimre


Leyla Zana Rûpel 3

'Berxwedan' gîhîst
10 saliya xwe

Gulay Çiyan Rûpel 10

Rizgarbûna jinan
peşveçûna şoreşê ye
Şevîn Yalçın Rûpel 7

Dewlet dikuje û vedişêre Dayik dipirsin 'Ka lawêne me?'



- Hêzên dewletê dema alîgir û mîltanîn PKK ê digirin pêşî işkencê li wan dikin, pişt re wan dikujin. Heta niha bi dehan êsîr bi vî awayî hatin kuştin.

Hêzên dewletê, li herêmê di nav bê çaretiyê de li çareyan digerin. Ji lewre her diçe nemirovahî û hovîtiya wan zedetir dibe. Hêzên dewletê dema alîgirê PKK ê û welat-parêzen Kurd digirin, pêşîn bi dek û dolapan, an ji bi tîrsê dikin ku wan bixin sîxur. Dema ku nikaribin bi ser kevin, van kesan di bin îşkenceyê de an dikujin an ji seqet dihêlin.

Têkoşer an ji gerillayê PKK ê gava weke dîl (esîr) dikevin destê hêzên dewletê, pêşî di bin îşkenceyê de derbas dikin, paşî dîbin li gundan digerin û di nav gel de wan teşîr dikin. Dûre ji diçin gundiyyê an ji mirovîn welat-parêz berhev dikin û ji wan re dibêjin ku hûn ji PKK û ne, hûn alîkariya PKK ê dikin, navê we me ji mirovîn PKK ê yên ku di destê me de ne girt. Hêzên dewletê bi vî awayî nêçîrvaniya mirovan dikin. Malbatan dîbin, bi rojan di bin îşkenceyan de dihêlin. Şervanîn Kurd Remezan û Ferhad di 16.4.1992 de li Sîrtê hatin girtin. Çapemeniya Tirkan ev agahdarf qet nedî.

Rûpel 15

Karkerê hemû dinyayê û gelêne bindest bibin yek

- Li hin welatên weke Tirkîyê, cejna 1 ê Gulanê hatiye qedexe kirin. Dewleta Tirk 1 ê Gulanê herçiqas qedexe kiriye ji, dîsa karkeren Kurd û Tirk vê olkê (zincîr) qetandine û di rastek û meydanan de kom bûne 1 ê Gulanê pîroz kirine û dê herdem vê cejnê pîroz bikin.

Dîroka 1'ê Gulanê ji 1886 an de destpêde. Di vê mîjo (tarîx) ê de karkeren Amerîkî, li hemberî dewlemdînê keddwar, dest bi livbaziya grevê

dîkin. Livbaziyan karkeran, li her aliye Amerîka belav dibe. Karkeren Amerîkî, livbaziyan xwe di bin dîroşmeyen (sloganen) yekîti, piştgirî û

têkoşîn de berhev dikin. Karbidesten Amerîkî bi firehbûna vê têkoşînê dikevin nav tirseke mezin û leşkeran bi ser karkeran ve dişin. Di êrişen leşkeran de li zêdeyî 100 kar-

ker têne qirkirin û ev livbazi bi van metodê hov tête pelişandin.

Ji vê rojê ve karkeren dinyayê tev,

Rûpel 15

ROJEVA WELÊT

"Realîta Kurd", "Partiya Kurd" û
"Televizyon kurdi"

E v gotin nuh in, ji gotinê heta niha cihê ne. Siyaseta înkarkirina Kurdan bû tarîx û ev ji flaskirina kemalîzmê ye.
Gotinê "Realîta Kurd", "Partiya Kurd" û "Televizyon kurdi" go-
tinên Demirel, Yılmaz û Özal in.

Rûpel 15

REWS

Abdullah Keskin



TV CEHŞ-TV GAP

Özal dîsa bombeya xwe avêt. Berê xwe da Amerika û pişti bi saetekî re go; "Divê qedexetiya li ser zimanê kurdî rabe û di TV GAP ê de programên kurdî çêbibin."

Daxwaza Özal, çiqasî samîmi ye û ji dil e, wê di demeke nêzîk de xwiya bike. Ew Özalê ku bi saya mîltarîfma 12'ê îlonê bûye serokwezîr, ne dûr berî bi du meha pişta xwe dida hêzên çekdar û fermana gelê Kurd dixwend: "Leşker wê werin, di çol û çiyan, bajar û gundan de yekî ji we nahêlin." Xwediyê van gotina Özal, gelo çima pişti du mehan, iro behsa demokrasiyê dike?

Mesaja Özal, tesîra bombekê kir û li rojeva Tirkîyê rûnişt. Herkes di bin mij û dumanan de ma. Lî niha ew mij û dumana belav dibe, rûçikê herkesî hêdî hêdî derdikeve holê. Berî her tişî durûtiya hikûmeta Demirel û wekîlî wî ïnönü eşkere bû. Ew hikûmeta koalisyonê ku ji herkesî re ïlan di-

kir, digo: "Me realîta Kurdan naskir." Rastîniya Kurdî ci ye, çawa tê nasîn? Sînorêna nasandina vê heqîqatê ci ne? Ev pirs li alîkî man. Iro ji her serîkî dengê dertê. Her deng rûresî û durûtiya hikûmeta DYP-SHP tîne ziman, ispat dike.

Gelo Özal ji ber ci ev teklîf kir?

Sebeba pêşî, iflaskirina nêrîn û politîkayênen nîjadperest e. "Inkar" û "imha" kirina 70 salî iro iflas kiriye. Di destê xwediyê xwe de, di wan destê bi xwîn û gemar de ma ye.

Listikênuh sernagirin. Weke "partiya nuh" TV GAP jî hêviyeke vala ye. Berî 10-15 salan li Iraqê televizyona Kurdî hebû. Her şev programên bi kurdî derdiketin. 3-4 cehşan her dem pesnê Seddam didan. Teklîfa Özal jî di vî warî de xwiya dike. Di demeke nêzîk de li cem hêkelê Atatürk 2-3 "korucuyan" derxin û li pişt wan jî "Ne mutlu Türküm diyene" binivîsin, tu kes şas na-be. Ne bi mirovahîyi dijiminatiyê "nêzîki" gelê Kurd dibin.

Radibin, rûdinê; nizanîn ci bikin. Ji ber ku têkoşîna gelê Kurd geleki bi pêş de çûye. Qatil in, nîjadperest in politîka û nêrînên xweyî kevn dixwazin bidomînin, lê dibînin û dizanîn ku ev metod êdî neçare ne.

Ji bo ci ev 70 sal in zimanê kurdî qedexe kirin, mirovîn Kurd lal û ji çand û kesîtiya

xwe re biyanî kirin? Ji bo ci? Dawî?... Xwiya ye. Dizanîn ku iro ew destpênekin, sibe "yêñ ji wan çêtir" wê destpêbikin. Dixwazin vê riye bigrin. Nikarin! Rê vebûye. Bi xwîna xort û keçan, zarok û jinan... Edî tu kes nikare vê riye bigre. Ev rê, ber bi mirovahî û azadiyê de ye. Rê li wan hatiye girtin, nikarin derbas bibin. Ji ber vê yekê li riye nuh digerin. Munaqşa televizyona GAP ê ji vê yekê hatiye holê.

Lîstikênuh sernagirin. Weke "partiya nuh" TV GAP jî hêviyeke vala ye. Berî 10-15 salan li Iraqê televizyona Kurdî hebû. Her şev programên bi kurdî derdiketin. 3-4 cehşan her dem pesnê Seddam didan. Teklîfa Özal jî di vî warî de xwiya dike. Di demeke nêzîk de li cem hêkelê Atatürk 2-3 "korucuyan" derxin û li pişt wan jî "Ne mutlu Türküm diyene" binivîsin, tu kes şas na-be. Ne bi mirovahîyi dijiminatiyê "nêzîki" gelê Kurd dibin.

Di televizyona cehşan da Mihemed Arif Cizrewî, Tahsin Taha, Ayşeşan û hinek hûnermendê din hebûn, tu kesî seyr nedikir, lê li radyoya Erîwanê herkesî dihisand. Aramê Tigran, Cemîla Celîl, Meyremxan hebû.

Gelê Kurd tu caran rû neda dagîkeran, dîsa jî nade.

Pevdeng

Zimanê kurdî, zimanekî hêsan e. Wek ku deng derdikeve, wisa jî tê nivîsandin. Ji ber vê yekê di kurdî de, dengderxistin, nivîsandin û xwendin wek hevdu ne. Mirov di-kare bêje, di nav koma zimanê Hînd-Evrûpî de, zimanê herî hêsan yek jê ji, kurdî ye. Lî, di kurdî de, bi tenê, di derxistina dengek û nivîsandin de, zehmetî heye. Du deng bi hevdu re derdikevin. Ji ber vê yekê ji, jê re bi kurdî dibêjin pevdeng.

Pevdeng (diphongue), ji du dengen pêk tê. Bi alîkariya dengdêrekê (bir sesli harf) dengê wê derdikeve. Di zimanê kurdî de, bi tenê pevdengek heye. Ew jî xw ye.

Mînak: Xwarin, xwar, vexarin, xwerû, serxwebûn, serbixwe, serxweşî, berxwedan, xwişk, xwelf, xwendin, xwendin, vexwendin, xwe, xwe, xwerû, xweperest, xwefiros, xweş û hwd.

FERHENGOK

Astengi: (engel)
Bername: Program
Beşdarî: Teşrif (katılım)
Cûre: Texlît (çeşit)
Çavkanî: (kaynak)
Đaristan: Dar û ber (orman)

Dilovanî: Şefqet
Geş: Gerr (gezi, tatil)
Girse: Kîtle
Hov: Wehşî
Maf: Heq (hak)
Mafdarî: (haklılık)
Mijar: Babet (konu)
Namebir: Postevan (postaçı)
Navgîn: Wesîte, alet, araç
Navgînê: ragihandinê yêngirseyî (kitle iletişim araçları)
Peywir: Wezîfe (görev)
Pispor: Spesiyalist (uzman)

Pirozname: Teprîk
Serwext: Bi fêm (anlayışlı)

Serwextî: Fêm (anlayış)
Rojane: (Günlük)
Rojnameya rojane: Günlük gazete

Sazgeh: (kurum, kuruluş)
Sernivîs: Navê nivîs (başlık, yazı başlığı)

Sel: Hareket (davranış)
Şirove: Tefsîr (yorum)
Şirovekirin: Tefsîr kırın (yorumlamak)

Tip: Herf
Wesan: Neşir (yayın)
Weşandin: Neşir kırın (yayınlamak)

Weşanxane: Neşriyatxane (yayinevi)
Weşanvan: (yayincı)

Wêne: Resim
Xêz: Xet (çizgi)
Zarava: lehçe, devok (şîve)

Zimanzan: Lenguist (dilbilimci)

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Durûtiya Demirel

Mumîn kî ye?

Gelê Kurd û Misilmanê reben, bêaqil bes e, neyîn leystikên dij-min, hişyarbin! Ka dijmin bi navê dîn û İslâmê û dibêje "Îne-mel mu'minune ixwetûn." Yanî hemû mumîn birê hev in. Rast e, birê hev in. Lî dijmin her dem bi vî awayî me dixapîne, belê ew bi xwe bi vê bawer nake (çawa ku bawer bi xwedê jî nake). Ku bawer bikira pêşî destê xwe li serê te nedida û dawî jî pihîn qûna te nedida. Ew hezkirina wî bi xwe ji bo menfeetê wî ye. Ev menfeet ci ye? Ev e, zengîniya sererd û binerîdê welat e. Ku tu deng nekkî, têkîlî karê wî nebî û ji koletiya wî dernekevî, ji te hezdike. Lî gava tu têkîlî wî bî, bêjî ez ji heme, an tu bêjî, birûyên ti li ser çavên te, êdî wey li halê te.

Ka bes e Kurdo! Bes e mela! Bes e sofi! Em mumîn in û Kurd

Mele Baran / Izmir

in. Ka binêr Pêxember Hz Mîhemmed di hedîseke xwe de çilo gotiye: "El mumînu, men emine nasu ela dimâhim we emwalîhim." (Taç. Rûpel: 27. rewahu xemse). Yanî, Mumîn ew kes e ku însan bi xwîna xwe û bi malê xwe jê emîn bin. Lo mela, lo seyda, lo şêx, lo hecî, ka tu ji destê vî dijminî emîn i? Ne anha, ji berê de, bav û kalê te, ji bav û kalê wan emîn bûn? Em mumîn tim û tim hatine xapandinê, çawa ku bav û kalê me xapandine û kuştine, mal û milkê wan xwarine û serdestî kirine. Lo bi navê yezdanê dilovan dikim ji vêga pê ve em naxapîn û em naxapîn jî. Emê biratiyê nasbikin û ew çiqas ji me re bîra bin emê ji ji wan re ewqas bîra bin.

Durûtiya mezin ew e ku tiştîn mirov pê ne bawer be û bixwaze bêje, lê tiştîn ku tê xwestin û pêne bawer be bêje. Ev jî stender-teke cotik bixwe ye. Iro berpirsiyariya durûtiyê komara Tirkîdike. Süleyman Demirel, ji bo vê minakeke diyar e. Durûtiya hikûmetê ya herî mezin, a li hemberî gelê Kurd e. Eger mirov kor û kerr nebe dikare vê bibîne û bibihîze. Demirel, gava bi rojnamevanan re û di televizyonê de dipeyive, mirov dibêje qey parêzgerekî leheng (qeherman) ê mafîn mirovan û demokrasiyê ye. Lî dema mirov li karwaniya (pratîka) hikûmeta Demirel dinêre, bi timî berevajîya gotinê wî dibîne. Lî ji bo kîrinê tu wêrîn (cesaret)a wî nîne. Dibêjin ku Demirel guheriye, we, weke berê nîne, anku bûye demokrat. Belê guherîn di Demirel de çêbûye, lê ne ji aliye qencyî ve. Demirel durûtiya xwe bêhtir xwirt kiriye, ji aliye durûtiyê ve jî hostatir bûye. Pa-qijiya Demirel weke gola ku bi timî bi ava qirêj tijî bibe ye.

Guherîna mirov divê li gor guherînê pêşveçûn ên li dinayê be. Di vî guherînê de divê tu paşverûtî nemîne. Divê guherîn bi giyanî (ruh) û bi zanistî be. Mirovê ku divê xwe nuh bîke û biguhêrîne, lazim e ku li ser bingehêke rastînî be, ne weke guherîna Demirel sixte. Belê Demirel dixwaze ku xwe biguhêrîne, lê nikare pêk bîne. İca xwe wisa dide nîşan ku mirov dibêje qey guheriye.

Sosin-Karanfil İHD Nisêbin

Bijî rojnameyî Welat (Soranî)

Min mindalek 11 salî mim. Min ji nawçeyî Mêrdîn im. Esta le Suêd dejîm û deçim bo dibistanî seretayî.

Min bi diyalektî Kurmancî jî zanim û deçim bo kursî (per-werdekirdin) soranî. Min, her hejmaref Rojnameyî Welat dexwînim û bi ew rojnameyî Welat zor kêfxweş debim.

Min dixwazim bi êwe bilêm ku, ji bo welat dinîvisînim û deng û bahsîn teze bo êwe dinêrim. Bijî Rojnameyî Welat û şehîdî me Agit û Mazlum û Kemal.

Seid Çiyan / Swêd

Ma nameya Xasî papestayê Welatê xwi be (Dimîl)

Eyro tornê Melay Xasî nameyîne A.Rahman, Hasan, Mustafa, M.Emin û Osman o. Samedê xebata Kurdan ra Xasî di serî sirgûnê Rodosî demand. La belê Şima ra ricayke min esto. Ayge bi dest beytani xun nuştibe aynen kalikê min heminen topkerdir heme beytan ay defter de bê. Ay defterê yevê cebê kalikê mi ra wet. Ma zano kamo, la belê e ege marê bişravo ma memnûn bêbe. Ma wazanêkî tarêxî xu bizanê eyro roc roc neyarê ìnê

Veysi Han

KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :
Paşnav :
Navnîşan :

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li Tirkîyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu

Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu

Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

Aboneyen hejâ,

Ji kerema xwe re vî cihî dagîrin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnîşana WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

6 meh

60.000

12 meh

120.000

Li derive

30 DM

60 DM

Gel rûmet nade mebûsên sixte

● 235 mirovên welatparêz bi hev re ji mebûsên SHP ê Abdulkerim Zilan, Fehmi Işıklar, Adnan Ekmen, Mahmut Alınak, Mahmut Uyanık û Salih Sümer re nameyeke eşkere rîkirin. Xwediyên nameyê vê nameya xwe bi civîneke çapemeniyê ji raya gişî re jî diyar kirin.

Gele Kurd, mebûsên Kurd ên ku hîna ji SHP ê veneqetiyane protesto dîkin. Çend roj berê 235 mirovên welatparêz bi hev re ji mebûsên SHP ê Abdulkerim Zilan, Fehmi Işıklar, Adnan Ekmen, Mahmut Alınak, Mahmut Uyanık û Salih Sümer re nameyeke eşkere rîkirin. Xwediyên nameyê vê nameya xwe bi civîneke çapemeniyê ji raya gişî re jî diyar kirin.

Ev mirovên Kurd ên welatparêz, di nameya xwe de wiha dibêjin: "Hikûmeta Demîrel û Înönü li ser navê demokrasiyê bi hemû tundîf û dij-

wariya xwe ve û bi şeweyekî hov diçe ser gelê Kurd, terora li ser gelê Kurd zêdetir dike. Di van hoyan de hûn cihê xwe li ba gelê xwe û kedkaran nagirin, hûn hîna di nav partiya SHP ê ya şovenîst de û bi wan re dimeşin. Ev rewşa we ji bo gelê Kurd heqaret e. Eger ev rewşa we ya nebaş berdewam be, wê nefreta gelê Kurd a li hemberî we zêdetir bibe, hûn jî dê di demeke kin de bibînin."

Gelê Kurd gîhîstiye qonaxeke nuh, hişyar bûye, li xwe, li mafîn xwe xwedî derdikeye, rûmet dide ronakbîr û ber-

pirsiyaren xwe yên qenc, rûmet dide mebûsên xwe yên ku pê re dimeşe. Dema kevin hatiye girtin, dema mebûstiya kevin jî hatiye girtin. Mebûsên Kurd êdî nikarin li ser pişta gelê Kurd bazirganî bikin. Mafî tu kesê nîne li ser pişta gelê Kurd bazirganiyê bike.

Mebûsên Kurd, eger li doza gel xwedî derkevin, mebûsên gelê Kurd in. Dema ev mebûsên han li hemberî doza gel weke mebûsên dewletê bilivin, tu firq di navbera wan û mebûsên din de namîne. Gelê Kurd li dijî mebûstiyeke wiha ye, vê mebûstiye red dike. Mebûsên Kurd ên ku hîna ji SHP ê veneqetiyane, divê rojeke zûtr li rûmeta xwe xwedî derkevin.

îmkanên xwe piştgiriya dewleta Tirk dike.

Komara Tirkîyê (KT), dixwaze dagîrkeriya xwe ya hezar salî wek berê bidomîne. Bi parêzgeriya gundan û bi kontrgerilla nikaribû Kurdan bera hevdû bide, di vî warî de şerê taybetî bi ser neket û di dîroka me de cara yekem e ku cehşîti wek dezge têk çû.

Lê şerê taybetî li çareyên nuh digere. KT, niha jî, dest avêtiye kevneperekstên Başûr. Dixwaze bi piştgiriya wan û bi hinek hevkâren welêt, dema pêwîst be bikar bîne, partîyeke hevkar damezirîne.

Birîna malbata Berzanî bi xwe pirr kûr e. Ji 40 salî û vir ve, Kurdîn hemû besen Kurdistanê di aliyê aborî, siyasî û leşkerî de bi hemû imkanen xwe piştgiriya wan kirin. Heta PDK, Partiyen besen din, wek ajanan jî bikar danî. Lê, piştî ku PKK dest bi têkoşîna rizgariya neteweyî kir, nema gelê Kurd alîkariya PDK kir. Bûr û baweriya otonomiya genî, ne bi tenê li besen din ên Kurdistanê, lê, li Başûrê Kurdistanê jî, wek îdeoloji iflas kir. Malbata Berzanî niha nikare li Başûrê Kurdistanê jî hikum bike. KDP niha, weke ew mirovî ku dikeve behrê û dest davîye kefê, dixwaze ji hevriyên (bermayên) teverîn têkçûyî (mexlûp), teverîn ji dewleta Tirk re damezirîne.

Bê guman bavê vê partiya, ku PDK dixwaze ava bike, Waliyê heremê yê berê Hayri Kozakçıoğlu ye. Wî pêşniyár (teklifek) wiha du sal berê anîbû. Diyar e, ev ne ji bo başiya Kurdan e. Hemû kes dizane, wê ev parti di bin

KONEVANIYA NUH

Leyla Zana



Mirovê gelê xwe neparêze û lê nebe xwedî bila bimre

D i 16.4.1992 de, geştek min û Orhan Doğan li çend bajarê Kurdistan'ê çêbû. Geşta me zehf girîng bû, lewra ji demek dirêj de Artêşa Tirk afatek bi sosret li serê Kurdan gerandibû û vê kotekiyê hêjî didomîne.

Artêşa Tirk bi tevaya Çekîn xwe yên giran li herêma Mêrdinê, gundê Stewrê û gundê Bismilê, li hawîrdor êrîşek mezin kir. Di vê êrîşê de 44 şoreşvan û mirovîn gundi şehîd ketin. Ji bona em şehîdan bibin goristanê me destûr ji qeymeqamê Bismilê xwest, Qeymeqam bi mekina xwe em birin gundê Tepê, em ketne rê pêde, Serleskerê Qolordiya Amedê İsmet Yediyıldız di rê de em sekinandin, ji qeymeqam re sixîf kirin go çîma te ev Mebûs li taqsiyê swar kirine. Orhan Doğan daket pêşîya Serlesker jê re got: "Qomûtanîm... Serleskerê Tirk nehişt ku Orhan gotina xwe xelaske. Serlesker got "Tu fihît nakî ji min re dibê qomûtanîm, ezê çîma qomûtanî te bim, ez qomûtanî Dewleta xwe me, hûn Kurd tev neyărê me ne, hûn tev terorist in û eşqiya ne, hûn bêhna xwe fireh bikin emê we jî bikujin, lê hêdî hêdî heyânî ku em ji çavê gel bîxînîn pêde vêca dor a we ye.

Gelî mirovîn bi rûmet û hêja, ku mirov rind biponije (bifikire) ev axaftina serleskerê Tirk di cihê xwe de ye.

Belê! Tê xwiyakirin ku Dewleta Tirk bi tevaya konevaniyên xwe yên tûj û di hêla din de jî bi konevaniyî nerm, bi fen û fûtan êrîşî gelê Kurd dike. Dewlet bi van konevaniyên xwe yên kotevê tiştekî nikare bibe serî, ev di dîrokê de jî li ber çavan hatiye xwiyakirin, bi qirkirinê tiştek nebirin serî. Di hêla din de jî dewlet ji demokrasi û mafîn mirovati diaxife, mafî demokrasi xwînê hildiweşîne, loma rîcêk tenê dimîne ji bona gelê Kurd, ev rîc iro li ber çavan e.

Em qet birakuji naxwazin, di navbera gelê Tirk, Kurd û hwd. de. Em biratî, azadî û mafîn mirovati, jiyanîke wekhev û demokratik dixwazin armansa me ji vê pêve tuneye.

Belê! Her wekî carêdin jî kû ez dibêm, dawiya kotevê yê nîne, kotevê wê rojekê bifetise, bi vê koteviya ku Artêşa Tirk dike Gel hêj tûtir, gernas û hevgirtî bûye, bi koteviyê û bê mafî mirovati tu hêzê meiinger, pişta gela nedaye erdê û nikare bide şikandin.

Lewra ji koteviyê iro gel bi mîranî li ser piyan maye, rûmet û namûsa xwe nema difroşê û nema davîye bin piyan, nema dike bin lingan.

Ka seba ci? ka ev zîlm û kotevê ji bona ci? xwîna her du gelan seba ci wê were rijandin, çavê dayikan çîma wê bi êsîr be, çîma zarok wê stûxwarbin, çîma bav wê bi kul û bi kovan bin, iro sedema vê xwînê, sedemâ vê koteviyê, neyartiya gelê Tirk û Kurd heşkere Artêşa Tirk dike, girîng e ku her du gel bicivin û vê pirsîrîkê safi bikin.

Bi aştî, biratî û wekhevî bi hev re bijin, bi serfirazî û bi rûmeti. Iro zehf kûr nebûye, lê ku sibehî ben qetiya hew dîghêje hevdu, wê bibe gola xwînê, ev pirsîrîka her du gelan e her mirovî bi rûmet girîng e ku bi şev û roj jî xwe re bike kar û xebat...

emrê dewletê de be û wê ve-
kirî li dijê têkoşînê be.

Li ser navê partiya nuh ro-

ja 19'ê Nisanê, Şerafettin El-

çi hedefîn wê di hevpeyvîna

xwe ya bi radyoya BBC re

wiha diyar dikir: "Partî, dê li

dijê şerê çekdarî be. Bi riya

aştî pirsîrî çareser bike. Gel ji

bin zordariya PKK'ê û dew-

letê rizgar bike." Bi van goti-

nan wî maskeya xwe ya hev-

kariyê eşkere dikir. Dîsan ew

gerîllayan û komikên mirinê

(kontrgerillan) wek hev dibî-

ne. Lî kesî nikare bixapîne.

Hevalê Şerafettin, Derwêşê

Sedo jî 20 sal berê diçû

MIT'ê û digot, "ez bi wan re

li ser pirsa Kurdistanê bazarê
dikim", dîsan digot: "pêwîst
be ez îxbara Koministên

Kurd dikim."

Şerafettin Elçi jî wê demê
di serokatiya vê partîye de
bû. Hetta sala 1972 an de
MIT'ê li ser navê KDP bela-
vok jî belav kiribû. Di vê bel-
lavokê de çep û sosyalistên
Kurd xayîn û kevneperekstan
jî wek welatparêzan nişan di-
dan. Lî ew di dawîye de bi
ser neketin û pelişin. Partiya
ku hêviya Mesud Yılmaz û
Erdal Înöni be, nabe hêviya
gelê Kurd. Partiya nuh
hêviya dewletê ye!..

Vahab Serin

Çûna Mitterrand a Tirkîyê ji bo 'PKK' bû

Zîna Şikakî

"Verg şîwaney meyan nêbeno" (Gur nabîne şîvanê miyan), dibêje penda Kurdi. George Bush dersa xwe ji Kissinger hilgirt û ferman da balafirê S. Husênu li Kurdan xîne. Di wê demê de, Kissinger hate Fransa. Rojnamevana jê pirs kirin ku ew trajediya Kurdan çawa dibîne. Kissinger li şûna ku ji ber 5 milyon Cihûyên ku Hitler kuştine de fedî bike û dilewî ji bo gelên bindest bişewite, rabû go: "min bawer ne dikir Kurd ewqasî birevine serê ciyan. Lî dîsa gerek e Kurd spasiya Bush bikin ku destê xwe daye wan!". Rojnamevanevêkî Firansiz di vê babetê de nivîsand ku li ba Kissinger Moral û Polîtik nabine yet.

Gava mediya li Ewrûpa li ser Kurdan xwe dixwar, ne ku berketiyê Kurdan bûn. Armançen wan ên siyâsî hebûn. Bo nimûne, gava Kurdan şerê leşkerê S. Husênu dikirin û Kurdistan rizgar dikirin; mediya Fransa Sosyalist digot: Kurd ci şer in, law! Kurdistan rizgar kirine û berê xwe êdî dane Bexdadê (ango Ereb netişt in). Gava Bush ferman da balafirê S. Husênu, eynî mediyayê got: wax, Kurd xwedî pirr parti ne, ji bo serokatiyê li dijî hev şer dikin, hemî ketîne gewriya hev. Kurd, Amerika rola da Fransa û bi navê Kurdan biryara 688 li Encûmena Parastinê standin û leşkeren xwe careke din di navcê de hiştin. Çima ev biryar? Ev biryar wê rê ji Amerika û hevalbendê wê re veke ku destê xwe têxine dewleta



Ji ber xwirtbûna têkoşîna gelê Kurd, dewletê emperyalist xwe nêzîkî dewleta Tirk dîkin.

ku berjewendiyê wan na-parêze de. Di wê navê de, Fransa rol standi bû ku NATO bişatîne û yeka mîna wê ji bo Ewrûpa çê bike. Brîtaniya ne a Margrette Teadcher, lî a John Major dizanî lîstikên Amerika û Fransa ci ne. İca, li dijî lîstikên wan tim derdiket. Amerika dixwaze ku ye-kîtiya Ewrûpa çê bibe, lî Ewrûpeke kolî, yeke ku nikaribe li pêş Amerika serî hilde. Ewrûpi ji vê yekê haydar in, ji ber vê wan jî êdî fêm kiri-ne.

Heçî Almanya, ew jî hatiye stewr kirinê, leşkeren Rûsyâ hin erden wê dagirtine. Ew dernakevin heta ku Amerika digot: çûye li ser mesela Kur-dî deng bike. Ev gotin rast e,

ew leşker ji bo ci lazim bin. Berf niha bi mehekê, Amerika kum ji serê Elo hilanî danî serê Welo. Wezîre Almanî yê bergiriyê ji wezîrtiyê daxistin bi mazereta ku çek firotine Tirkîyê û Tirkîyê pê Kurdan dikuje. Bê gûman, ên wekî Turgut Özal dizanın mesele ci ye, ji ber vê yekê ceger pê re çê dibû ku ji Helmut Kohl re bibêje "Hitler". Pirr neçû, Mitterrand bi çend wezîran ve çuye Tirkîyê. BBC ya Londonê henekên xwe bi vê sere-danê dikirin û li ser dilşewatbûna Xanim Mitterrand ji Kurdan re dikirin ka çima ew jî neçûye. Mediya li Fransa dîkî eşkere ji yekî veşartî çêtir e.

Rojekê bîranîneke xwe ya xweş ji min re got. Digot: "Mustafa Kemal gazî min kiribû, ez jî rabûm çûme Enqereyê. Evarê li koşkê ez qebûl kirin. Dîsa mîna hercar, li dora sofra wî hevalen wî hebûn, xwarin û vexwarin dom dikir. Ji min re got; 'Mamoste, ez hezdi-kim tu ji iro pê de li ser Hakimîyî Millîye binivîsinî, ezê gelek kîfxweş bibim. Ez nivîsarên te dixwînim, zehf xweş in, ew biyaniyên li wê derê ne jî nivîsarên te dixwînin.' Ez hinek fikirîm, min go; 'Paşa, tu berê ji min re bêje ka tu ci yi? Eger tu bêji ez dîktator im, ezê her roj binivîsim, bêjîm dîktatorî zehf idareke rind e, na, ku tu wisa nebêji û bêji ez demokrat im, ezê her tim demokrasiyê binivîsim. Lî belê rica min ji te ew e ku tu bêji ka tu ci yi. Vê ji min re bêje, ku ez li gora wê binivîsim'. Giliyê min xelas bû, içar ew hinek fikirî, ji hevalen xwe re got; 'Sibê tedarikê mamoste bibînîn, bila bizivire İstenbolê.' Ez jî sibehê bi trêne dageriyam İstenbolê, êdî me tu car hev û din nedît.'

Niha suxtên wî yêni di zanîngehan de nêzîkî 100 mirovi ne. Min ji gelekan re got, kî ci dizane bila binivîsîne, emê bikin kitêbekî. Gişkan bi dil qebûl kirin. Bila Şükrû Baban winda nebe.

Heçî guftûgoyen li ser PKK, gava Mitterrand lingê xwe daniye ser axa Tirkîyê, delegasyona Tirkan bi serokatiya wezîre hundir tafile berê xwe dane Sûriyê. Ev bûyer tev bi hev ve girêdayî ne. Ji Sûriyê re problemeke Kurdî li Tirkîyê hebe çêtir e. Eger Tirkîyê bê problem be dikare wekî çawa bi Qibrîsî kirin, Amerika bi destê leşkerê Tirk bi wê jî bike. Diyar e serokê Sûriyê fêm kir ci bi delegasyona Tirkan re hebû, serokê wê jî rabû çû hawara dewletên Ereban bike.

Çima Amerika dixwaze PKK hilîne? Ne ku PKK partîyeke Markisî-Lênenî ye û li dijî emperyalizma Amerika ye, ne ku wê rolekê bidine Tirkîyê ji bo Qazakistanê û dewletên din, lî nêrîna wan ji Tirkîyê re û ji mesela Kurdî re ne mîna ku PKK dirame ye. İqtîdarî leşkeri li Tirkîyê vê dizane, lî ew jî li gor plana Amerika kar dike. Ew iqtîdarî hanê hazır e ku plana Amerika bi cih bîne, lî ne hazır e ku mîletê Kurd û Tirk bi bîrâtî di konfederasyonek de bi hev re bijîn. Heta hikûmeta Tirkîyê bixwaze mafîn Kurdan bidinê jî, ew nahêlin. Niha S. Husênu bixwaze hikûm berde û bireve jî, lî wê pê bigirin û nehêlin. Roja ku Amerika bibîne ku hikûmeta Tirkîyê ketiye tengahiyekê an xwestiye bi Kurdan re rûnê, wê wergerkekê amade bike, wekî çawa li sala 1980 an dekirin. Çîroka emperyalizmî, a rîjîmîn dîktator û a mîleten bindest giş ev e.

Çûna Duglas Hurd a Tirkîyê jî, Wezîre Karêne Derve yêni Brîtanî, ne ku ji bo paras-tina Kurdan bû. Brîtaniya ji tim dixwaze rî li ber Amerika û Fransa bigre. Ji tîrsa mesela İrlanda re, Brîtaniya êdî dixwaze sînorîn siyâsî yêni berê bi carekê ne livin.

Divê Kurd şîyar bin ku he-ta idareta Bush û Fransaya Sosyalist hebin. Dewleta Tirk bi awakî fermî (resmî) mafîn Kurdan nanase. Em hêvîdar in ku Kurd şîş tênegihêjin ku em propaganda PKK dîkin. Na, em dixwazin diyar kin ku çarenusa Kurden Bakûr iro di xetereke mezîn de ye. Di vi warî de, êdî Kissinger bûye pispor, tecruba wî pirr bûye. Çavên wî dibirrin ku nîvîkî Kurdistana Bakûr ji Kurdan vala bike, nîvîkî din jî bi sed besî bike. Rewşa Ereban û a mîleten din li pêş çavêne tevan e. Divê Kurd di vê rewşa tevlihev de bi kîmanî li hev bin; ji bo berjewendiyê şexsî di destê gewrehêzan de nebîne lîstik. Bila em 70 salen din jî bindestiyê nekşînin.

GOTİN

Yaşar Kaya



**Ord.Prof. Şükrû Baban
(Şukrî Begê Babanzade)**

Dî saxbûna wan de min sê heb endamê "Kürt Teali Cemiyeti" dît. Rehma xwedî lê be, yek jê Ordinaryûs Prof. Şükrû Baban, Yê din Mehmet Şükrû Şekban, yek jî Şêx Şefiqê Avrasî bû. Wî çaxî ez 20 salî ya hebûm, ya tune bûm.

Şükrû Baban, ji malbata Babana bû. Li zanîngeha İstenbolê, li ser iqtîsad (aborî) ê mamosteyek zehf mezin û bi nav û deng bû. Nav û dengê wî li dînyayê jî belav bûbû. Ez bi kekê Musa re 3-4 car çûme koşka wî, me bi hev re firavîn xwar. Zana û rojdîtiyek mezin bû. Bi pirtûk û nivîsarên xwe, li temamê dînyayê dihate naskirin. Bi Almanen ku ji ber rejîma Hitler reviyabûn û hatibûne İstenbolê re zanîngeha aborî (Fakulteya iqtîsadî) ava kiribû. Bejneke dirêj lê hebû, bi qed û qamed bû, kîcîn zehf desmala wî bi qerenfileke

teze ve ji berîka wî qet kêm nedibû, Dersên wî û zimanê wî xweş bû. Ji bo lix-wekirin û kîncîn wî, di kitêba zanîngehê de wiha nivîsîne: "Bir cümle iki satır / mendili, karantili ile Babanî hatırlatır."

Li Parisê xwendibû, mirovîkî zehf bi xof û bi heybet bû, zehf henekan dikir. Menderes û Bayar jê rica kiribûn, lî ew nebû rîberê wan, zanibû ku êdî dawîya wan hatîye. Li rojnameya 'Yeni Sabah' ê li ser siyaseta derve dinivîsi. Mîsyonê diplomasîyê gişk nivîsarên wî dixwendin, nivîsarên wî bi zimanekî zelal û hêsan bûn. Diplomatîk Kevin bû, kul û derdîn dînyayê zehf baş di-zanibû.

Di malbatên Kurdistanî de malbata Baba-nîyan malbateke mezin e. Pişti xwendina Parîsê, diçe Misrê dîbe Komîserê Osmaniyan yê bi selehiyet. Paşa dizivire tê welat. Di dûre wî li konsolosya Moskovayê dîkin katîbê yekemîn. Li wê derê, pişti şoreşa Oktobrê, Çîcerîn, Trotskî û giregirên şoreşa Oktobrê nasdice, zehf tê hezkirin, hemû xwestinê wî tînîn cih. Çîcerîn dinêre, di nav konsolosxana Tirkîyê de ew tenê zana ye. Dostaniya wan dom dike, heta ku ji Moskovayê diqete.

Ewrûpa, komara Tirkîyê û pirsa Kurdan

Hemû tiş bi xwirkirina têkoşinê ve girêdayi ye. Ewrûpa, her neteweya ku xwe li Efrîka û Asya azad kir, berê red kiribû, paşê bi xwe ew bombe kiribû. Lê, ji bo domkîna dagîkeriyê, dema ku gel rabûn, çare nedîbûn. Dûre ew dewletên Ewrûpa koloniyên xwe yek bi yek terk kiribûn. Heta paşê, xwe bi wan re kîrin dost

Di cîvatîn irohî yên nûjen de, têkilî û danûstandinê navneteyî di navbera her dewletî de hene. Ew dikarin bazirganî (ticâri), aborî (ekonomik), konevananî (siyasi) û leşkerî bin. Di van waran de, xwirt û girsbûna pêwendiyân dikare dewletek rûres û dagîker, sîstemek antîdemokratik û paşverû re gelek dewletên hevalbend û alîgir çêke. Ji bo vê sedemê û ji bo vê armancê ðî di navbera gelek dewletên cîhanê de gelek dezgah û saziyên navneteweyî an jî konsey û komîte ava bûne. Ew sazûman ji bo berjewendîn (menfeîten) her dewletî hatina ava kîrin. Hinék dewlet bi hebûna van di kar, hinék ji di zîrâde de ne. Berjewendî dikare di warê ewlekî, hevkî û alîkariya eskerî û aborî de be. Di vî warî de, çend mînak dikare li jîr bête dayin. Bandoriya Peymana Atlantîka Bakûr (NATO) saziyeke eskerî, Koma Aboriya Ewrûpa (AT) jî ya aborî ye. Konseya Hevkî û Ewlekariya Ewrûpa jî saziyeke din e. Parlamentoya Ewrûpa û gelek saziyên din jî hene.

Dewleta Tirk, ne endamê KAE (AT) ye, lê endamê hemû saziyên din yê Ewrûpa ye. Pişti 12'êilonê, bi serokwezîrbûna T. Özal, Komara Tirk, bo ku deriyê Ewrûpa ji xwe re veke, bi her awayî dişixule ku Tirkîyê têxe nav bazara Ewrûpa. Lî, ji bo ku Tirkîye were qebûlîrin, diye çend şert bêne cih. Yek ji van şertan mafen mirovan e. Yek jî, bi aşî çareserkirina pirsa Kurdan e. Ew dewletên ku endamê van saziyan in, ne heyranê Kurdan û ne jî heyranê mafen mirov û demokratik in. Guhertinê ku di sistemê reel-sosyalist de bûne û raya gişî ya Ewrûpa û Cîhanê, sistemê kapitalist yê Ewrûpa û Emerîka mecbûr kîriye ku bi pîrsîrîkîn cîhanê û herwiha bi pîrsîrîkîn welatê me re mijûl bibin. Li aliyê din hişyarbûn, serîhildan û serî gerîlla ku mirovîn me ber-va mafen çarenîsi dibe, bûye sedemîn (sebebîn) ku Ewrûpa êdi ji vê pîrsî re nikare bê deng bîmîne. Lî, Ewrûpa, di vê qonaxê de, ji bo Kurdan, dewletek serbixwe naparêze û nikare biparêze jî. Sê (3) sedemîn vê hene:

1- Pêwendiyê Ewrûpa û Emerîka bi dewleta Tirk re hene û ew pêwendî, bi van sazûmanîn ku me li jor bi kurtî behs kir, dewletek mecbûr dike ku ji hev re rind bin. Berjewendiyê van dewletek ji hev re alîkari pêwestibîne.

2- Perspektîfa şoreşa Kurd pir fireh û û dikare bi serkevtinê, ji împerialîzmî re bibe talûkek.

3- Gelê Kurd hîn di dema xweqebûlîrinê de ye. Yanê, em di destpêka şoreşa neteweyî de ne.

Ji bo ci dewletên cîhanê, bi taybetî dewletên Ewrûpa ji Kur-

dan re alîkari nakin?

Bersîva van pîrsan dîrokê daye. Lî, li jor disa jî bi kurtî behsê xalan bûbû. Li vê derê mirov dikare xala dawîn bi herdu pîrsen ku paşê hatin nîvîsandinê ve girêde û guh bide çend gotinê serokatiya têkoşinê ku demekê berê di Welat de cih girt. Wiha tê gotin; "Di dînyayê de jî wê dosten me çebîbin. Wê me nas bîkin, wê qîmetê bidin me. Wê bîbinin çawa gelê Kurd dibe xwe ïnsaniyeta pêşverû. Hingê dinya mecbûr e alîkariya me bîke."

Bi vê daxwiyanî gelek tiş tîne gotin. Lî, dîsa jî mirov dikâ-

gel û têkoşinê de nakokî (dijîtî) peyda kîriye. Gelê Kurd jî iro di destpêka xwirkirina têkoşina neteweyî de ye. Neyar û Ewrûpa di qonaxa irohîn de ne mumkun e ku ji daxwazên me re, tewreke pozitif nîşan bide. Heger sibeh, em nakokiyê (çelişkiyê) ku li welêt hene ji holê rakin; heger xayintî û xwefiroşî êdî li dij şorê nikarîbin rawestin; heger gelê Kurd bi fedekarî tevlî têkoşinê be, dê şerten pozitif ji bo me jî peyda bibin. Protesto kîrina Ewrûpa ji paş bûyeren Newrozê jî nîşan dide ku gelê Kurd di riya rast de dimeşe. Hîn ew jî destpêk e. Hemû tiş bi xwirkirina têkoşinê ve girêdayi ye. Ewrûpa, her neteweya ku xwe li Efrîka û Asya azad kir, berê red kiribû, paşê bi xwe ew bombe kiribû. Lî, ji bo domkîna dagîkeriyê, dema ku gel rabûn, çare nedîbûn. Dûre ew dewletên Ewrûpa kolo-



Divê gelê Kurd pêşî bi xwe bawer be û xwe nespêre tu hêzên dagîker.

re vê dîtinê bi kurtî şîrove bike. Di destpêka her têkoşinê de problem gelek in. Ne tenê dagîkerînê welatê me, lê dosten neyarê me jî, bi me re neyartiyê dîkin. Li hemû derîn cîhanê, dema ku çin an jî netewe li dij koledarî û dagîkeriyê serî rakirine û dest bi têkoşîna azadiyê kîrine, dagîker û kevneperestan ew şerîn mirovîtiyê bi teror iham kîrine. Neyaran her dem ji bo sekinandin an jî şikestina têkoşinê dest avetîne her metodî. Gelek pere ri-jandine, top û bombe bi kar anîne. Bi sedhezar mirov kuştine. Lî, xeynî metodekî qet tiştek pere nekiriye. Ew metod jî, di nav

niyên xwe yek bi yek terk kiribûn. Heta paşê, xwe bi wan re kîrin dost. Ji bo berjewendiyê xwe yên aborî, di destpêka avakîrina dewletên nuh de alîkari jî dabûn wan. Roj bi roj dewletên nuh hatin naskirin. Pêwendiyê diplomâtik û aborî baş bûn.

Bi kurtî, ew şert û ew rewş ji bo gelê Kurd jî derbas dîbe. Divê em netîrsin û moralê xwe, bo ku Ewrûpa ji me re alîkari nake, xirab nekin. Bi bilindkirina têkoşinê, bi gavên gîs, Ewrûpa jî dê alîkariya me bike û di vê cîhanê de cîhekî biçûk, lê azad ji bo gel ê Kurd jî ava be.

M. Ali Tüysüz

Dewlet diranê xwe ji komalan re dişidîne

Hêzên dewletê di 24'ê Nisanê de saet di navbera 7 û 8 an de avetîn ser çend komalîn girseyî yên demokratik. Ev komalîn ku polîs avetîn ser wan ev in.

Bender, Tûm Öz-Der, Demkad, İssizler Derneği, YKD.

Polsen ku diavêjin ser komalan duduyêwan sivil û yên din ji bi çek bûne. Polis di lêgerînê xwe de defterîn komalan ên ku navêndamên wan qeyidkirî bûnî bi xwe re dibin, eşyayêwan li hev dixin. Flama, wêne û diayêwan bi xwe re dibin dest didin ser van eşyayêwan. Di vê lêgerîna polisan de çend kes jî ji curbe cur komalan digirin lê dawiyêwan berdidin. Ew kesen ku ji hêla polisan ve hatibin girtin jî navêwan seroka komala Bender Elmas Yalçın, endam Eda Ak, endamî heyeta birêvebirinê Halit Karakaya, ji komala Özgür-Der'e Mehmet Güven, Mehmet Tan, Aysel Kaval. Li komala YKD yê jî kontrolla nasnameyan tê kîrin ên ku li nasnameyan wan tê nîhîrtin, Besra Yice, Sakine Akdemir, Songül Yuce û Yıldız Durmuş in.

"Hêzên dewletê yên Ewlekariye" berê jî avetîbûn ser çend komaleyeñ gîrsî yên demokratik û deriyêwan dada bûn. Ev kîrinê dewletê dide xwîyan ku naxwaze tu kes tu rîxistin û tu hêzek li ber pozê xwe bibîne. Ên ku li hember kîrinê wî derdîkevin mafî jiyanê nade wan.

Li ser bûyerê, çapemeniya burjuvazî bi nûçeyen çewt rawestiya. Xwedê giravî di lêgerînan de gelek tişten partiyen ilegal bi dest ketine. Ji ber vê hêlwest (tavir) a çapemeniya burjuvazî komalan daxwiyanan ji bo çapemeniyê kîrin û vê hêlwesta çapemeniya burjuvazî protesto kîrin.

Zana Farqînî

Qatilê Siddîk Bilgin salek tenê ceza girt

Serleşkerê Tirk Ali Şahin di 31'ê Tîrmehê 1985 an de li Bîngolê mamosteyekî Kurd Siddîk Bilgin bi işkenceyê kuşt. Derheqê vî bînbaşî û çend leşkeren din doz (dawî) hat vekirin. Bînbaşî Ali Şahin û hevalen wî bi tenê salek ceza girtin.

Li ser kuştina Siddîk Bilgin raya giştî ya dînyayê û Tirkîye gellek rawestiyen. Ji ber vê yekê jî, dewlet nikarîbû ku vê dawî veşere. Ji lewre derheqê bînbaşî û hevalen wî de dawî tê vekirin. Ev jî bi timî sembolik e.

Heta niha bi sedan welatparêzen Kurd ji hêla hêzên dewletê ve hatin kuştin, tu kes nehat girtin û di derheqê kesî de jî dawî nehat vekirin. Eger di derheqê işkencekar, xwînrij û mirovkujan de wiha bi tesadûfî daweyek jî vebe, ceza jî ji salekî zedetir nîne.

Özgür-Der: "Wê keleha zordestiyê hilweşê"

Özgür-Der, terora dewletê ya li ser gelê Kurd û şoreserên Tirk bi belavokeke çapemeniyê protesto kîrin. Özgür-Der di belavoka xwe de li ser terora dewletê radiweste û wiha dibêje: "Roj bi roj rûyê dewletê yê hov eşkerter dîbe. Rêvekarên dewletê her dem dabaşa demokrasî û mafen mirovan dîkin, dibêjin "em dê pîrsîrîkan tev di nav demokrasiyê de çareser bikin". Belê di demokrasiya wan de hêzên dewletê her tiş e, dadmend e, dadgîr e, berpîrsîyare infazî ye, cellad e. Kes nikare hêzên dewletê tewbar bike, ji lewre ew ji bo bexteweriya civakê henin. Li sikakan malan û hwd. mirovan dîkîjin, malan û dikanan dişewitînin vanâ tev ji bo "bexteweriya civakê" dîkin.

Hêzên dewletê di nav civakê de çiqas miroveke bi rûmet û bi nîrx heye, tev ji xwe re weke neyar dibînîn. Dixwazin wana tev ji holê rakin, dema fersend bibînî jî dîkin. Belê dewlet civakê bi siyaseteke zorbaz birêve dîbe. Hikûmet jî siyaseta xwe li gor xwestekîn Encûmena Ewlekariya ya Dewletê (EED) saz dîke. Lê divê rêvekarên hikûmetê û yên dewletê baş bizanibin ku ev zordestiyâ wan bê dawî nîne. Gel li hemberî vê zordestiyê bê deng namîne, wê keleha zordariyê hilweşîne.

NÜÇEKURT... NÜÇEKURT... NÜÇEK..

Memûr meşyan

Di 26.4.1992 de Memûr ê Malîyê ji bo mafen xwe û konevaniya (siyaseta) dewletê protesto bikin 300 mirov meşyan, devê deriyê postexanê ji bo telgrafan rîbikin û dewletê protesto bikin. Polisan dora wan kir xeley û rî nedane wan, pişte jî êrisî ser wan kirin, 5 mirov jî xistin binçav.

Polis girte ser şeva welatparêzan

Di 25.4.1992 an de li Enquerê şevek hate amadekirin. Di vê şevê de koma folklorê a çanda Mezopotamya jî cih stand, li devê derî polisan desmalen kesk û sor û zer ji wan standin. Pişte rîzânê koma folklorê di sahnê de şirovekirineke wiha kir: "Dewlet di hêlekê de ji demokrasiyê diaxive, ji serbest kîrina Ziman û Çanda Kurdi diaxive, di hêla din de jî cilê me yê Neteweyî qedexe dike, belê desmalen me ji me standin, lê dîtin û ramana me, ji mejiyê me nikarin derxînîn."

Zêdeyê hezar mirovî di şevê de cih standibûn, di şevê de komê temsila şeva Çaran û ya Mazlum Doğan çekirin...

Protestokirina şeva Deniz Gezmiş

23.4.1992 li Enquerê ji bo şeva Deniz Gezmiş û hevalen wî ku eliqandibûn şevek amade kirin. Gelek rîkxistin û mirovî şoreser ev şev protesto kîrin, lewra ku li ser navê Deniz Gezmiş di şevê de Şûşê Araqê li bin guhê hev dixistin û bi hêviya nemiran dilîstîn, loma mirovî bi rûmet ew protesto kîrin...

Filmê Ermenî: Mayrig

Z. Şikakî

Çiroka nivîskarê Ermenî **Henri Vernueil** (filmek bi du perçan jê hatiye çê kirin: 1) Mayrig (bi Ermenî "dayîk"; 2) 588 rue Paradis (588 Riya Buhîstê). Berî mehekê, ev herdu film li salonên sîne-mayê Parîsê dora du-sê mehan dihate nîşan dan. Niha li bajarê wekî Clichy hîn têne nîşan dan. Girêdana van herdu filman jî bi wan çend pirtûkê nebaş ku li Fransa li ser Kurdan derketine re heye. Gava herdu film derketin, propaganda wê le ser Televîzyona Fransizî, Kenala 2-ê, hate kirin. Henri Vernueil û aktorê serekîn ê Misrî, Omer Şerîf, bi xwe hazir bû bûn.

Li vê dawiyê, damarêniyan jî li dijî Kurdan rep bûne. Li Ermenistanê, beşekî Zazakî çê kirine cîma arman-ceke wan a siyasi jê heye. Ên li Ewrûpa xwestine careke din, lê bi awakî din, qirkirina Ermeniya bidin nas kirin û bîdin nîşan. Ev herdu film di çarçova vê armancê de hatine çê kirin.

Perçê girîng ji film Mayrig

Dinya de xêlê welatê bindestî biyê û huna jî estê. Lê belê koledariye qe jû welatê bindestî de ze welatê ma târibato girs nêkerdo yan jî nêşîkiya bikero. Koledariye herhetra welatê ma, zonê ma, mordemê ma, bi kîlmiyê şarê ma biyena dînê ra veto, kerdo çiyêde bîn. Na derheq de talê ma şaranê bindestanê bîna pêrîne ra xirabêrî bî û xorabêrî yo. Serbeta ke kole-darêke ma kerdime binê des-tanê xo, kolêdaranê dinya pêrîne ra zafêrî xedâr ê, pêrîne ra tayîna zêde barbar ê. Na êna fam kêrdene. Heto bîn de jî guna û şasitiyê ma, xele-tiyê ma biyê û ewro jî estê. Eke ma xo ra bipersîme, yan jî uyêde xerîb ma ra biperso, vaco ke "Sedemî peydemen-denâ Zonê şima, yan jî peydemdenâ şima bi xo çek ê?" ma şîkime sedema niya ze cêrî rêz keme.

1- Politika dewletanê kole-dara.

2- Zanayê (Alimê) Tirka, Ereba, Farisa ebi serê xo niyê. Ê nakê xo ra girêdayê politika dewleta xo yê. Ê xo-ser niyê.

3- Zanayê kurda ya seba şarê (miletê) xo şenik kar kerdo, yan jî no karoke ïne kerdo nêbiyo malê şarî, yan jî xo ra dot kes nêdiyo, xo teyna xo-ser diyo.

4- Wendekar û şagirtanê kurda zonê (ziwanê) xo, xo vîra kardo, tayekî ebi nayê nêmendê zonê xo zontiyê ra veto. Hurêndîya Çêver ca

e. Di destpêka xwe de, film Dewleta Ciwan-Tirkan bi awakî têorîk tawanbar dike. Çend rengê işkencelerin jî nîşan dide. Yekî Ermenî ku ji qirkirinê xelas bûye û gihiştiyê bajarê Fransizî, Marselî, çiroka xwe hewal dide ku çawa Tirkan û Kurdan ew kuştine. Gava digihêje gotina Kurd, ê aktor ji bo ku kesê Firansiz gotina "Kurd" û "Tirk" li hev nexe, dibêje: "Kurd ha, ne Tirk! Ne eynî tişt e. Ew aktorê û li ser televîzyona M6 weşanekê bi navê "Venus" digerîne, jinan ji jêr heyâ jor dihêle xwe tev tazî bikin, paşê diyariyekê di-de wan!

Li dawiyê, gava zabitên Tirkan bi hezaran Ermeniyan wekî kerîyan didine ber xwe û ji welêt derdixîn, pîrrê wan ji ber pîrr sedeman di rî de dimrin. Li paşiyê, berî ku wan ji sînor bidin derbas kîrin, rastî goleke avê tê. Ermeniyê dil ji tîna re ketine, dixwazin avê vexwin. Hew dinêrin siwar derketin. Zabitên Tirkan ji Ermeniyan re dibêjin: "ev jî Kurd in, bi-rayen me ne, hatine hawara

me". Pîlek naçe, zabitên Tirk û siwarên Kurd tivingê xwe serrastî wan dikin û hemiyan bi devegezê di golê de dirêj dikin. Gol ji xwînê sor dibe. Film wîsa tewaw (xelas) dibe.

Cîma Ömer Şerîf wekî aktor hatiye bijartî? Ji ber ku Ereben li Ewrûpa bi geleme-nî û ên li Fransa bi taybeff, li dijî Şerîf Giravê bûn û piştgîriya S. Husên dikirin. Anglo, Ömer Şerîf ne ji Kurdan, ne ji Tirkan hez dike. Paşê, ew aktorê ku wekî "siwarên Kurd" nîşan dan, reşikên Efrîq bûn. Bi vî rengî, armanc ku sûretêkî nebaş bidine Kurdan.

Ez vê gotarê dinivîsînim, lê dilê min pîrr dêşe ku hîngê Kurd jî û Ermenî jî bû bûne qurban, lê û Ermenî rabûne neheqiyê li Kurdan dikin. Herwekî ew ji mîj de li Ewrûpa û li Amerîka ne, cihêن xwe baş girtine, karfîne lêkolînan li ser dîroka xwe çê bikin, dînyayê jê agahdar bi-kîn, lê ê me Kurdan? Ev hîn bûye deh sal ku Kurden me derketine Ewrûpa. Ma rast e di rewşike wiha de ku ûro ew li Ewrûpa ji me xwirttir in, werin lingan bidine ber Kur-

dan? Eger dixwazin dîrokê bi vî awayî bixwînin, cîma lo-man ji xwe nakin û diyar na kin ku diya Sultan Ebdil Hemîd Ermenî bû? (Bîranîn Sultan Ebdil Hemîd bixwînin)

De ka em qirkirina Erme-niya bixwînin ku berî niha çawa hatiye nas kirin. Li ser qirkirina Ermeniya di sala 1984 pirtûk semivîsa wê

"Le Crime du silence, le génocide des Arméniens" (gunekariya kerrbûnê, qirkirina Ermeniyan) hatiye çap kirin. Pirtûk ji aliyê Gerard Chaliand û hinê din ve amade bûye. Tê de, Gerard Chaliand spasiya Yilmaz Güney jî dike ku piştgîriya wî camêriyeke bilind e. J. Salıyan İsmail Beşikçi jî ji bir ne kiriye ku çawa dewleta Tirk ji bo mesela Kurdi wî dixe zîndanan.

Pirtûk berhemâ Dadgeha Dayîm a Miletan e. Avakerê Dadgehê sénator û jûrîstê Italî, Lelio Basso, bû; serokê wê François Rigaux bû. Gire-gir û zanayê her ên navdar li cihanê endametî, piştgîri û besdariya vê Dadgehê bûne. Lista navan pîrr dirêj e, biborin ku em nikarin navan gişan hewal din. Dadgeh ji 13 ra (ta) 16 Nisanê 1984, li Zankoya Sorbonê li Parîsê vebû bû. Pirtûk giştik 377

rûpel in. Gotina "Kurd" bi çeyî an bi xirabî ku em di raporê pêşkêşî Dadgehê bûne de, dibînin, di van rûpelan de ne: 23, 33, 35, 37, 85, 112, 124, 125, 151, 154, 163, 169, 170, 171, 173, 187, 190, 323, 329, 353.

Em pirseke serokê Dadgehê ji xwediyê raporekê nîşan didin:

Pirs: Belavkirina Ermeniyan li sedê XIX an li hundir Emperetoriya Osmanî ji ber siyasetekê hati bû, an encamên zordariyê desthelat-dariyê Osmanî bûn û xwes-teka wan ku miletê din li Ermenistanê bi cih bikin?

Bersiv: Ermenî tim di bin zordariyê de bûn ji ber ku si-yasetâ Osmanî dixwest mile-tan tevlihev bike, ên li Bakûr bîne Başûr û ên ji Başûr bîne Bakûr. Encama wê ew bû ku hejmara Ermeniyan li Ermenistanê kêm dibûn. Sedemê wê yên aborî jî hebûn.

Di pirtûk de, bîryara Dadgehê û raporê zanayê Ermenî bi xwe Dewleta Tirkan tawanbar dikin. Heta serokê Dadgehê wan dikşîne ser berpirsiyariya Kurdan jî, lê ew diyar dikin ku Tirkan Kurd bi kar anîn. Divê em diyar kin ku hin rapor hewal didin çiqase Kurd jî di wê demê de hatine kuştin.

Amorê/marê zanayanê manê ke di diyalektanê kurdi zanê, qasê peçikanê jû destî yê. Nê diyalektî jî zafêrî "kurmançî" û "soranî" yê.

Zanayê manêke "zazakî" û diyalektêde bînê zanê, zaf ê. Lê mi ze cor jî va nê jî şanika û lawika ra dot nêşiyê.

Nika perseme, na pêgoşî eyştena "zazakî" ma ra ci (k) gureto yan jî ma rî ci ardo?

Qe bêfikiriyene mordem şî-kîno vaco, nayê ma rî qe ciyê niyardo, vernayê ma ra xêlê berdo. Merik wuştî ra, vato û vano: "zazakî/zazayî/dimîlî/dimûlî" zonê kurda niyo, zonê ma dimiliyan o. Serbeta ke zonêde "zazakî/.../..." esto, miltetede dimili jî esto. Zazakî zonêde xoser ro". Wun-ciya no mordem yan jî nê mordemî xerîta "zazaistani" onta, vaysto ke sarê ma jûbînî ra cûda kero, vazeno ke ze mese-banê İslâmî şarê ma lete kero. Nayêde, eke kesoke "zazais-tan" ïda keno, palê û xulamî dişmenî niyo. Xeletî û kemasi-ya zanayanê ma, rewşenbîranê ma zaf a, guna û şasitiya zana-yanê ma, rewşenbîranê ma qasê ê kesanê bîna nêbo jî, ê dîna ra këmtir jî niya. Gere ma nayê ra dime xo nê xeletiyanê xo ra ra xelesnîme, karê xo bi metodanê zanitene û kolektif bikeme. Eke nayê ra dime jî zanayê ma ra wurze û biwazê nê karf wunciya ebi şanika û ebi ê ciyanê bîna ra xelesnê, nayê jî kes nêşîkîno fam bikerî û weş nêvîneno.

Zonê ma û rewşenbîrê ma

L E R Z A N N J A N D I L

mede de vato "Qapî kapat-mış meke". Hurêndîya na-manê kurdi de namê tirkî, ere-bî, farîsî nê xo ra.

5- Zanayê kurda diyalektâ "Zazakî" ser ro hama hama qe kar nêkerdo. Karoke biyo jî ya xêlê şas o, yan jî xêlê ke-masiya xo esta.

6- Zanayêke diyalektanê kurdi ser ro kar kerdo yan jî xebetiye jî, hînî zanito ke ïna herçî kerdo saff, qey êndînayê ra dime kar çîno.

Ma sedemanê ju yîn (zu yîn) û didîne ca verdîme, nîna ser ro herkes qasê xo zano, qasê xo nîna ser ro kar kerdo û nê, yanê polîfîka koledara û girêdaya zanayanê koledara bi dewletanê koledara ra, sarê, hama hama sarê herkesi de zelal ê. Ma sedemanê kîrîne û çarîne ser ro vînderîme. Qey ke nê girêdayê manê, teyna ma şîkime nîna bikeme rayst, dermanê nîna ma dest de ro, ma kur da, zanayê ma

kurda dest de ro.

Ma C. Bedirxanî ra bicîme hatanî ewro, qe jû zonzanayê kurda diyalektanê zonê kurdi ser ro nêxebetiye. Pêro, zon zanayê kurda pêro teyna jû diyalekte ser ro xebetiye, yan jî zafêrî di diyalektâ ser ro. Nê diyalekt jî zafêrî "kurmançî" û "soranî" biyê. Diyalektanê zonê kurdi ra "zazakî" qe balê kesî nionto. Eke onto jî, teyna çîroka de, şanika de û estaneka de mendo. Baş, çîroka şanîkî letêde kultirê/candê ma yo. Bê dînê nêbeno, bê dîna kultur, edet, karekter û tayê ji dîroka/tarixê şarê ma rind û bêkemasiyê nêno fam-kerdene. Lê belê no nêno a mana ke, ma pîlanê xo ra şanika, çîroka bîmusîme û nîna binivîsnîme ke, pê çap keme. Karê rewşenbîra/roşnabîra teyna arêdayen û nîvisnayena şanika, lawika û çîroka niyo. Na derheq de tayê zanayê ma xêlê avê şiyê, lê teyna xebera

Ma C. Bedirxanî ra bicîme hatanî ewro, qe jû zonzanayê kurda diyalektanê zonê kurdi ser ro nêxebetiye. Pêro, zon zanayê kurda pêro teyna jû diyalekte ser ro xebetiye, yan jî zafêrî di diyalektâ ser ro. Nê diyalekt jî zafêrî "kurmançî" û "soranî" biyê. Diyalektanê zonê kurdi ra "zazakî" qe balê kesî nionto. Eke onto jî, teyna çîroka de, şanika de û estaneka de mendo.

Rizgarbûna jinan peşveçûna şoresê ye

Şevîn Yalçın

Em di pêvajoyeke wisa de dijîn ku ji her alî ve şerê têkoşîna rizgariya neteweyî bilind dibe. Li serê çiyan şerê gerilla, li zindanan şerê girtiyâ, li bajar û gundan serhildanen gel bi ser bilindî û lehengî ber bi serkevtinê ve diçê. Di vê pêvajoyê de giringiya maf û azadbûna jinan ji doh bêhtir derdikeve holê.

Pirsgirêka gelê Kurd a herf girîng û ciddî azadî û afirandina mirovê azad, afirandina nasnemeyeke azad e. Welatê gelê Kurd li çar beşan hatiye parave kirin, nasnameya wî ya neteweyî û zimanê wî hatiye înkâr kirin û di bin zordes-tiya dagîrkeran de şerê heyîniyê dide. Kesaniya mirovê Kurd zêde pêşve neçûye, ji ber ku li hundir di bin tadayiya feodalan de, ji derve jî di bin tadayiya helandina dagîrkeran de maye. Gelê Kurd ji mafê xwe yê xwendin û fêrbûnê bê par maye. Ev jî jê re weke qederê hatiye kifş kîrin. Lê gelê Kurd bi pêşveçûna têkoşîna rizgariya neteweyî, dîwarên ku li çar-medorê wî hatiye risîn hildi-weisîne.

Têkoşîna herî mezin a hişeyî ye, girîngiya têkoşîna di nav malbatê de jî nayê înkâr kirin. Paşverûtiya malbatî iro li pêşîya pêşveçûna civakî û neteweyî astengeke mezin e. Pêşveçûna civakê û serkevtina şoresê bi azadbûn û rizgariya jinan ve girêdayî ye. Be-revajîya vê jî rast e. Şoreşa ku jin tevlî nebe bi ser nakeve. Li welatê me têkiliyêni di nav malbatê de li gor xwestina mîran hatine ava kirin. Di van têkiliyan de wekhevî nîne. Di van pêwendiyân de mîr desthilatdar (egemen)e. Jin weke malekê bi timî di bin otorîta mîrê de ye. Jîna wê di nav malê de derbas di-be, tu pêwendiyêni wê yên derve nîne.

Di nav têkiliyêni bazirganî û feodalî de mirov nikare qala pêşveçûna jinan bike. Hîna di zarokatiya wê de pêşîya pêşveçûna ramaniya wê tê girtin. Jin bi kesaniyeke qels mezin dibe. Kesaniya xwe nikare derxe holê, kesaniya wê bi mîrê wê ve girêdayî ye. Mîrê wê ji bêkarî û zehmetiyêni derve ditengije, hîrsa xwe ji jina xwe derdixe



Di vê dema nuh de girîngiya maf û azadbûna jinan ji doh bêhtir derdikeve holê.

Di nav têkiliyêni bazirganî û feodalî de mirov nikare qala pêşveçûna jinan bike. Hîna di zarokatiya wê de pêşîya pêşveçûna ramaniya wê tê girtin. Jin bi kesaniyeke qels mezin dibe. Kesaniya xwe nikare derxe holê, kesaniya wê bi mîrê wê ve girêdayî ye. Mîrê wê ji bêkarî û zehmetiyêni derve ditengije, hîrsa xwe ji jina xwe derdixe

û feodalî de mirov nikare qala xwe ji jina xwe derdixe. Ji ber ku mafê jinê ji bo biryaran-zarokatiya wê de pêşîya pêşveçûna ramana wê tê girtin. Jin bi kesaniyeke qels mezin dibe. Kesaniya xwe nikare derxe holê, kesaniya wê bi mîrê wê ve girêdayî ye. Mîrê wê ji bêkarî û zehmetiyêni derve ditengije, hîrsa karêne derve pişta jinê

dişkêne.

Jinê Kurd ên ku ji ber zordesiya dewleta Tirk ji Kurdistanê derdikevin û têne li metropolên Tirkîyê bi cih di-bin, ji ber hin sedeman rewşa wan xiraptir dibe. Ev jinê han an di karêne besît-giran û kempere de dişixulin û kesaniya wan hin xiraptir dibe, an jî di hundire malê de ji her tişti dûr û di nav hevberiyeke mezin de jiyanâ xwe pûc di-kin. Ji çanda xwe dûr dikevin lê nikarin weke bajariyên Tirk jî bijîn, di televizyonê de tişten nuh dibînin lê nikarin bistînîn.

Lê têkoşîna rizgariya neteweyî gelek tiştan rohnî kiriye, ristek (rol) a civakî baş derxistiye holê (meydanê). Berpirsiyare vê rewşa xirab a ku jinê me tê de ne, beriya her tişti sazûmana dagîrkeriyê ye. Ji lewre jina Kurd bê du-dilî li hemberî dagîrkeriyê di nav refen gerilla de cihê xwe digre.

Dema jin bîr û baweriya xwe ya azad, hişê xwe û rîxistiniya xwe pêşve bibe, wê gavê li hemberî kedxwariyê, dagîrkeriyê û perçiqan-dina jinan keleheke saxlem tê lêkirin.




Bışeng Anık

Bışengê tu kulîlkî

Hebû keçek li milê Botan
Navê wê Bışeng hevalbenda karkeran
Hate girtin roja cejna Kurdan
Lê kinin işkence û zilmeke gîran
Bışengê xwe ne sparte dagîrkeran
Qîrdikir: "Ez Kurd im keça Kurdan
Her bijî serxwebûn û serhildan
Canê min gorî bo doza karkeran
Da ku rabe ji ser gel ev zilm û talan"
Bi vî awayî şehîd ket kuşîla Kurdistan
Şehîden me namırın

Xwişka Bışengê
Müzeyyen Anık
Aydın



Otonomî firotina gel e


Têkoşîn, xebat û daxwaza hemû neteweyan û têghiştâzadiyê û hişyarkirina neteweyî û mafdariya ji bo rejimekê, di warê aborî, çandî, ramyarî û leşkerî de serbixwe, ji bo bîryardana pêşerojê û pêşvebirina rewşa mirovayetiye, şoressê û şaristaniye (medeniyetê), damezrandina dewletek serbixwe û azad pêwîst e.

Em gereke vê pirsê baş roñi bikin ku rewş bê têghiştin. Kîjan daxwaz, dijminê daxwaza pêşveçûna neteweyî ye? Li ber çavan e ku ev daxwaza li dijê pêşdebirin û kemîlîndina neteweyî tî Otonomî ne.

Lê em gereke bizanibin otonomî ji ku derketiye, armanc û hedefen otonomiyê ciye?

Otonomî, di bingehê xwe de, bîryardana li serxwe ye, lê ne bîryardanekî siyasi ye û ne zelal e. Bi qasê ku neteweyan bigihîne armanc û hedefen wan ên siyasi, ne fireh e.

Berî hemû tiştî em gereke bizanibin otonomî weke termometre ye. Camâ sar dibe, dikeve û



Otonomî weke termometre ye. Camâ sar dibe, dikeve û camâ jî germ dibe bilind dibe û hertim ji guhertinê re ve kiriye. Kî dilê wî bi ku ve bixwaze bi wê ve dikşîne.

dikeve û camâ jî germ dibe bilind dibe û hertim ji guhertinê re vekiriye. Kî dilê wî bi ku ve bixwaze bi wê ve dikşîne. Ji ber ku di gelek warî de bi dewleta navend ve

girêdayî ye. Sînorekî otonomiyê nîne. Herêma otonom, bixwaze nexwaze, bê destûra dewleta navend nikare guhertinê mezin çêke.

Dewleta navend diktator û

kevneperek be, herêma otonom jî ji vê siyaseta çewt û xeter re dibe alet.

Dema ku mirov li dewleta Osmaniyan a kevneperek mîze dike, van rewşan baştıribîne. Di sala 1510 an de şerî di navbeyna dewleta Osmaniyan û Sefaviya de, dewleta Osmaniyan, ji bo ku Kurdan bike alîkarê xwe, hînek mafîn taybetî dan Kurdan. Pişti ku Osmaniyan ji şerî bi hêz derketin ev mafşûn ve girtin. Gelek carêndin, dema ku Kurd bi hêz dibûn ku şerîn hundirîn nebûna jî, dewletê bi xwe derdixist û ew hêz belav dikirin. Dewleta Osmaniyan ji hêzîn Kurd re sînorek dânbûn, dema ku ew sînor bi-hata derbaskirin, Osmaniyan ew dipelçigandin.

Sala 1823, 28 ê Temmuzê de, Safevi û Osmaniyan li dijê Kurdan bi hev re peyman (Antlaşma) çekirin. Xalekê wê peymanê, "hatîn û çûyîna koçerîn Kurdan nav sînorê dewleta Osmaniyan û Safeviyan" bû. Ev peyman qedexe dikirin.

Ev jî nişan dide ku dagîkerên welatê me dema bi hêz

bûna, înkariya hebûna Kurdan dikirin. Lê dema ku jar diketin, li xapandina wan digerîyan û hînek mafîn derewîn ên ku wan bi hêz nakin didan wan.

Van dewletan, niha navê wan mafîn derewîn kirine otonomî. Emperyalîzma Ewrûpa, dema ku Asya û Afrikayê ji bo xwînmîjîye dagîker û kire mêtîngîh, bi navekî din otonomî yê derxistin pêş. Ev rewşa ha bi pirrânî di nav welatê İslâmî de derbas dibû.

Armanca mafî otonomiyê, dirêjkîrin, hilwesandin û talankirina welatê mêtîngîh bû. Em dikarin bêjin otonomî ji welatê Emperyalîst û mêtîngîhkar ve maye. Xerentiya otonomiyê a pêşerojê ji bo gelê bindest, tenê, paşîtin, hilwesandin û neman e.

Ewên ku fro li başûrê Kurdistanê hikum kirine *bin destê xwe, nikarin daxwaza gel a serxwebûnê bînin ziman. Ji ber ku hemû bûne dûvê dewletê ku Kurdistanê di nav xwe de parvekirine. Ew li gora berjewendiyen (menfeetîn) wan, daxwaziyên xwe datînin holê û ji wan destûrigrin. Ev daxwaziya ji otonomiyê, di nav pêvajoyê de, bû trajedî û wêrankirina gelê Kurdistanê.

Zagros

Di civateke demokratîk de cihê şovenîzmê tune ye

Cumali Cotkar

Heger neteweyek, di her dema dîroka xwe de, xwe ji hemû neteweyen cihanê çetir, baştıribûn gîrstir bibîne û xwe bi vî awayî nîşan bide yan jî xwe hewcedarê vê propaganda dêrewçîn û fasîst bibîne, wê çaxê di derekê de çewtiyek, şâsiyek, xetak heye. Heger dewletek, her roj di daxwiyaniyê xwe de, behsa neteweya xwe ya ezîz, artêş (ordu) û polisîn xwe yên qehreman bike, wê çaxe di dereke vê dewletê de çewtiyek, xeletiyek heye. Heger Serokkomar, Serokwezîr, hemû Wezîren din û hemû rîvebirîn meqam û saziyên din, di her axafîn xwe de behsa xwîrî û têkûzbûna dewletê û hêzîn din yên dewletê bikin, dîsa wê çaxê di bingeha avahiya vê dewletê de xirabiye heye.

Di cihanê de qet mirov û rîvebirîn dewletekê ewqas dewlet û neteweya xwe derna-xin ezmana. Qet endamê civat û neteweyekê, di cihanê de ewqas behsa gîrsbûna xwe nake. Sedemîn vê nexweşiyê ji bo gelê Kurd diyar e. Dewleta Tirk bi bîr û baweriyeke kevneperek, şovenîst û nexweş dameziriye. Hemû saziyên vê dewletê di bingeha xwe de bûne avahiyê büçük ên dewleta mezin. Artêş bi serê xwe dewlet e. Polis bi serê xwe dewlet e. Nêxweşxane û karxane bi serê xwe dewlet in. Bi kurtî hemû saziyên vê dewletê bi serê xwe bûne dewletê

welatê xwe azad bijî. Ew her deverê Welêt bi hêzîn şer dağır û tîjî dike. Gelê Kurd pêşniyar û daxwazan ji bo çareserkirina pîrsê tîne, ew bi plan û programê vebîrîna Kurdan ve dadikeve.

Gelê Kurd gelekî birîndar e. Di bin kotekan da birîndar bûye. Şovenîzma dewleta Tirk û hêzîn wan ên leşkerî gelê Kurd birîndar kîrinê. Mirovîn sistem û dewleta Tirk jî birîndar in. Ew jî, ji bo ku gelê Kurd bombe û işkence dike, birîndar in.

Lê birînen Kurdan birînen laşan in. Zû xweş dibin. Belê ew, di mîjîyan de birîndar in. Birînen wan piir giran in. Qet xweş û baş nabin. Di warê birîndariye de li cihanê nimûne gelek in. Gelê Almanyê hîn jî birîndarê nazîsma Hitler e. Amerika birîndarê Hiroshima, Vietnam û gelek cihîn din e. Fransa birîndarê Cezayîr û Irak birîndarê Helepçe ye. Tirkîye birîndarê Koçgîrî, Ararat, Dersim, Amed, Şîrnax, Nîsêbîn û Cizîra Botan e. İro, bi domkîrîna metodîn dîrokî, birîna Tirkîye hîn jî kûr dibe.

büçük. Hema hema her mirovîn vê dewletê û herwiha vî neteweyî xwe wek dewlet dibînîn. Dewlet ci bibêje, mirovîn kuçê jî wek dewletê dibêje. Hismendî (siur) ji kollektivîzûn mirovatiye gelekî dûr e. Hismendiya vî neteweyî bi perwerde û hîndekarya şovenîzme çêbûye. Her mirovîn ku di mekanîzma dewleta Tirk de bûye xwedîyê berpirsiyari, ser û hisê gelê Tirk bi nakokî, neyartî û bi dijwartiyê tîjî kiriye. Qet natiye bîra kesî ku nakokiyê civakî ji holê rake û ramânî (fîkrîn) mirovahî, wekhevî û biratî biçîne. Ne konevanî (siyaset), ne perwerde (egitim) û hîndekarî (ögretim) û ne jî çapemenî û zanîngeh bi pîrsenî mirovatiye ve mijûl bûn. Ji bo van û gelek sedemîn din neteweya Tirk rewş û daxwazîn gelê Kurd fîmnake.

Gelê Kurd ji wan re destê mirovatiye dirêj dike. Ew gelê Kurd gullebaran dîkin. Gelê Kurd ji wan re behsa biratîyê dike. Ew destê xwe didin ser devê me û dixwazîn zimanê me jêkin. Gelê kurd behsa aşî û wekhevî dike û dixwaze li

XÂÇEPİRS

Çeperast:

- 1- Serokê Komara Mehabadê, di wêne de tê dîtin.
- 2- Elamet, şanî / Nexweşîneke hespan, rûam / Notayek
- 3- Bajarek Japon-yayê, di sala 1946 an de Jî teref Emerîka bi bombe-ya atomî hâte xerakirin.
- 4- Sembola Radon / Paşpêye erê / Pîvandina erdê welatêki.
- 5- Şenahî, dawet / Ideoloji.
- 6- Li Mezopotamyayê navî împaratoriye kevin, pêşiyen Kurdan / Eşq.
- 7- Bi zimanê biyanî hember / Endam.
- 8- Sembola Sodyûm / Seqem, cemidandin.
- 9- Lez / Di elfaba kurdi de tîpek.
- 10- Ne kûvî / Şahnazî.

Polisîn ku ji bo wezîfîn taybetî tê amadekirin, niha li welêt bi kuştina sîvilan tê nasîn.

- 4- Sembola Radon / Paşpêye erê / Pîvandina erdê welatêki.
- 5- Şenahî, dawet / Ideoloji.
- 6- Li Mezopotamyayê navî împaratoriye kevin, pêşiyen Kurdan / Eşq.
- 7- Bi zimanê biyanî hember / Endam.
- 8- Sembola Sodyûm / Seqem, cemidandin.
- 9- Lez / Di elfaba kurdi de tîpek.
- 10- Ne kûvî / Şahnazî.

Serejér:

- 1- Leheng, egit.
- 2- Pişti duakîrinê tê gotin / Geometri.
- 3- Dînya bi wan şen dibe û bi şekiye

BERSÎVÊN XÂÇEPİRSA HEFTEYA ÇÜYİ:

Çeperast:

- 1- Celilê Celil.
- 2- İsot / Dumahîk.
- 3- Nijad / Rez / Ma.
- 4- Arîlêker / Ban.
- 5- Si / İranî.
- 6- Kutkutok.
- 7- Lî / Mela.
- 8- Hekîm.
- 9- Om / Raman.
- 10- Vagon / Ra.

Serejér:

- 1- Cînavk / Hov.
- 2- Esîr / Ulema.
- 3- Lojîstîk.
- 4- İtalîk / İro.
- 5- Dê / Umman.
- 6- Éd / Kîte.
- 7- Cure / Oldar.
- 8- Emerîka / Na.
- 9- Laz.
- 10- İh / Ba.
- 11- Lîman.
- 12- Kanî.

xwe, bi siya xwe, bi hêşînaya xwe fêdeyeke mezin dide in-san û sewalan / Celebek jehriyê, pê mişkan dikujin / Celebek enstruman.

- 4- Aktuel, rojane / Tenû.
- 5- Pétal, ew darê ku agir bi serê wî ve hatibe da-dan / Di notayê de dema ra-westandinê.
- 6- Nexweşînec çavan.
- 7- Mirovperwerî.
- 8- Şefeq, sorahîya ufqi / Cenaze.
- 9- Dengê mêsinan / Cihê hêrandina celebên genim.
- 10- Celebeke feki.
- 11- Naveke mîran.
- 12- Cihê ku xwîn tê de digere.

BERSÎVÊN XÂÇEPİRSA HEFTEYA ÇÜYİ:

- 1- Celilê Celil.
- 2- İsot / Dumahîk.
- 3- Nijad / Rez / Ma.
- 4- Arîlêker / Ban.
- 5- Si / İranî.
- 6- Kutkutok.
- 7- Lî / Mela.
- 8- Hekîm.
- 9- Om / Raman.
- 10- Vagon / Ra.

Serejér:

- 1- Cînavk / Hov.
- 2- Esîr / Ulema.
- 3- Lojîstîk.
- 4- İtalîk / İro.
- 5- Dê / Umman.
- 6- Éd / Kîte.
- 7- Cure / Oldar.
- 8- Emerîka / Na.
- 9- Laz.
- 10- İh / Ba.
- 11- Lîman.
- 12- Kanî.

NEQUSK

Amadekar
Aram ÇemDizdê xiyaran
zimistanê vejeno

Gotina pêşiyên Kurdan

Seb û fesadî



HUN LIWAN
GUHDARİ NEKİN
ŞİKENÇEYE XWE
TSİDOMİNİN

dike. Belê di heqê wî de car-dî di vê tarixê de tiştekî gele-kî xweş hat gotin. İşçiye li Aydin temamê laşê xwe di-ke weqif. Niha adetek derke-tiye ku yek laşê xwe bike weqif wê dilê wî, gurçikêñ wî, çavêñ wî bi hinik sax ve-kin. Lê mérîk şertek kiriye weqfa xwe. Dibê ku ez mi-rim hûn perçen min bi kê ve-dikin bi wan vekin, lê bi Özal û malbata wî venekin.

Nizanîm işçiyê me yê de-lal ev mesela di tarixa İslâmî de bihîstiye yan na. Mesele wiha ye. Dibê rojekê li Bexdê berxekî çavresi sê me-hî sipehî anîn ku ji imamî Ezem re şerjêkin. Yekî ji imam wiha pirsî: "Muhterêm, ev heywana xweşik ku hê tu tam ji dinyayê nekiriye ma şerjêkirina wê ne guneh e?" Bersiva mérîk imam Ezem hezretlerî wiha bûye: "Na kurê min, tewer em qen-ciyê bi vî heywanî dikan. Di quranê de heywanek tenê de here buhiştê ew jî kuçikê Es-habilkaf Qetmîr e. Niha ezê vî berxikî bixwim, wê tevlî xwîn û laşê min bibe, bi qe-weta xwedê ew jî bi min re wê têkeve cenetê."

Îca ka em bê ser işçiyê xwe û malbata Özal an. Ez dibêm hema tirsa işçi ku navê perçen wî bi Özalan re bin, ji ber vê fikrê ye: İşçi dibê çawa be ewê herin ceh-nemê ma ci ji min re lazim e, perçekîn min ên feqîr jî bi wan re bişewitîn. Min gelekî divabû ez vî kirekara camêr bibînim, min divê ku em hemî xwe ji wan li vê dinyê û li wê dinyê jî bi dûr xin.

M. R. Anter

Di 18.2.1992 an de waliyê ku-nuh tayîn bûn li Çankayayê cûn zi-yaretiya Turgut Özal. Turgut Özal, ev şîret li wan-kir: "Dijmin seb û fesadiyê ji aliye polis û eskerê we de dibêjin: Yeqîn mekin, divê herkesi ji we li wilayeta xwe destê xwe bidin pişt polis û eskerên xwe."

We zilamê mezin dît bê ci şîretan li waliyê xwe dike. Yanî mana wê ew e ku hûn jî alikariya polis û eskerên xwe

bikin, kî bêje nebêje bila iş-kencê, zilmê û xerabiyê dom bikin. Heta niha min digot çawa di derheqê Özal de ew-qas tiş têne gotin û çawa dihêle, çawa tehmûl dike. Lê min nerî ku heylo mérîk li ku ye. Lo li kerxanê bezandin, kirin diz, kirin xesbçî, ji aliye pîreka wî û zarokên wî de tiş nema ku nehat gotin. Bû xezûrê defçîyan lo hezar tiş gotin ne xema wî ye. Ez dinerim, vê şîretê li polisan jî

Hûn çawa dixwazin bila wisa be!

GÜNÜN YAZISI

OKTAY EKİ

Dewleta Tirk ji aliye ve gelê Kurd qir dike, çapeme-niya Tirk vê rastiyê vedişêre û partiyen dewletê tev bi hev re pişgiriya vê qirkirinê di-kin. Ji aliye ve jî divê ku xwe demokrat û şérîn bide nîşandan. Divê ku bi vê şeweyê rûyê xwe yê bi xwîn veşere. Ji bo ku bikaribe raya giştî ya Tirkîyê û dinyayê bi-xapîne partî û rojnameyê xwe jî gelek baş bikar tîne.

Piştî qirkirina gelê Kurd a di şahîyen Newrozê de partî û rojnameyê Tirk ji bo çare-serkirina pirsgirêka Kurdi re

û reçetan pêşkêş kirin. Di rastiya xwe de armanca wan pêşigirtina têkoşîna rizgariya neteweya Kurd e. Lê armanca wan ci dibe bila bibe, ev bi xwe re rastiyek derdixe holê. Riya minaşekirinê ya li ser pirsgirêka Kurd vebûye. Ev êdî nayê girtin. Ev jî ji bo gelê Kurd pêşveçûnek e.

Nijadperesten wek Mesut Yılmaz iro dibêjin: "Dibe ku partiyekê Kurd bê dameziran-din, ev tiştek ne xeter e. Ev partî dikare serx-

webûna Kurdistanê biparêze." Nivîskarê rojnameya Hürriyet Ertugrul Özökök jî li ser vê dî-tinê radiweste û divê ku bê minaşeqe kirin. Nijadperest navdar Oktay Ekşi dibêje ku: "Tu ci dixwazî bixwaze... tu welatekî serbixwe dixwazî, bila be. Mirov dikare li ser vê minaşeqe bike."

Em baş dizanin ku armanca dewletê ne minaşekirina pirsgirêka Kurd e. Niyea dewletê qet tune ku pirsgirêka Kurd bi riyeke demokratik çareser bike. Lê nikare pêşîya lehiya têkoşîna rizgariya neteweya Kurd jî bigre. Wê gelê Kurd pirsgirêka xwe bi têkoşîna xwe ya bi rûmet çareser bike û riya demokrasiyê jî veke.

TİR

Musa Anter



Dibe dibe

Miletên ku ne cihgirtî bin û koçer bin işen wan-ên ecêb hene. Mesela iro, di al (beyrêq) a serokcumhûrê me de 16 stêrk hene. Rojekê min pirsî, min go ev ci stêrk in? gotin heyran her stêrekê di tarixê de berbengî dewleteke Tirkan e. Min got, ma kijan dewlet in? (Ê kû ez û ew bi hêv re dipeyivîn profesor Ahmet Ateş bû, Turancî bû û li gor niha ger ne heqaret be Türkçeçî bû) Got Musa, dewlet û împaratoriyyen me Tirkan koçeve ne yanî koçer in. Min go, ê lawo, ku em Kurd ji koçerên xwe bîhesibîn û carekê aleke me çêbîbe, em dikarin 50 stêrk pê ve deynin, wek; Rojkan û koçerên Rojkan, yên alikan, yên Pencenâyan, yên Milan, yên Heyderan, yên Hesenan, yên Celaliyan û bi sedan yên din. Ev eşîren me ji tu dewlet nasnedikirin û di bin siya serokatiya xwe de bûn. Ê ma hûn çîma nîvstêrekê din ji bi beyreqa xwe ve venakin, ew nîvstêrk ji bila ji bo Qibrise be.

Ez dinêrim ev dîrokên bêaqîfî, ku ketin tarixa miletan, ew milet li dînyayê lêvok dibe. Çîma iro Tirk bi xwe hisiyane dibê, ji Tirkan pê ve dostân Tirkan kes tuneye. Hûn çîma qebehêtî li miletan tînin. Ê lawo niha li dînyayê 170 milet hene, ma kî ji van miletan re hemû gotiye bibin neyarêne Tirkan, ne gereke mirov ji xwe re bifikire kurro.

Xwedê qebûl neke, demekê ez ji zabiteke qehreman bûm. Me dersa dûrbûnê dida eskeran, em topçî bûn, di tesbita armancê de mekîne hene. navê wê telometre ye. Mirov li cihê armancê binêre û mekîne ji mirov re dibê evqasî dûrî te ye. Ku mekîne tune be, mirov tiliya xwe yê girdê dide ber çavêñ xwe li armancê dinêre û li gora we hesab dike. car din ku mirov nizanibe, mirov neqeba xwe û armanca xwe dûr û nêzîkiya wî hîn dike. Lê îca ku mirov ji tiliyê jî fêm neke û telometre ji tune be? Tirkan tiştekî ecaib derxistiye, bi tirkî jê re dibê "Olsa olsa usulî", yanî gerek-e evqas be, lê tim ev texmîna mirov vajî derdikeve. Ez niha dinêrim ev olsa olsa usulî ketiye heyata dewleta Tirkan ya hiqûq û idarê ji. Tim dibê olsa olsa. Yek ji van olsa olsayan, li welatê Kurdan ev jehra korucu û olağanüstü hal e. Kuro lawo, îsal evqas sal we got olsa olsa lê tim tivingen we qerewanê dirin, yanî li hedef û armancê naaktiv. Vê mesela qerewanê ez kin ji we re bêjim. Berê li eskeriyê ê ku li nîşanê nedixist ceza dikirin û dişan-din qerewanê xwarin dihanîn û paşê ji qerewanê bi wan dişüstün.

Yen ku Tirkîyê idare dikin ji 6-7 paşayen qerewanetiye ne. Niha dibê emê 4 mehîn din ji li Kurdistanê qerewançîtiyê dom bikin. Ê lawo îsal çend sal in we ev iş dirêj kirin, hûn bûn qatîlen bi hezaran Kurd û Tirk, heta ji we çend paşayen bi vî aqîfî hatin kuştin, me ci fêmkir? paşeno hişê xwe bidin serê xwe û yeqîn bi-kin êdî ew 'Yeniceri axalerî' bi destê we naaktiv. Binêrin niha, yek ji we ji Bedîsîye û herî mezinê we ye, mérîk dibê ez ji Kur-distanê me. Lawo paşano hişê xwe bidin serê xwe, nekevin ber gunehêne Kurd û Tirkan.

Dewlet bav û zirbav e

Dewlet kî diparêze û kî naparêze, bavê kî û zirbavê kî ye?

Dewlet zirbavê Kurdan e, zirbavê karkerên Zonguldakê ye.

Dewlet zirbavê mirovên destteng û xezanan, jîn û zarokên bêçare ye.

Dewlet zirbavê tebiatê, şînayî, biharê, Newroz û rengên kesk, sor û zer e.

Dewlet zirbavê terziyan, dikandaran, gundiyan, esnaf û halnexweşan e.

Kî ma, mane Holding û şirket û Febrîkatorên mezin. Dewlet bavê xwedîyên holdingan, şirketan milyarderan e. Bavê Sabancîyan, Eczacîbaşyan û Wehbî Koçan e.

Dewlet bavê polisan, generalan û kontr-gerilla ye. Dewlet li aliye neheq û zaliman û li hemberê xelkên Kurd û Tirk e.



POLİTİKA

Ertugrul ÖZKÖK

Kar û xebatek bê betlan û bê bêhndan

'Berxwedan' gihîst 10 saliya xwe

Gulay Çiyan

Berxwedan gava derketibû wiha gotibû: "Bi xeml girtina, pîv û kirtên demokrat û welat-hezî ya Kurdistan, bi girêdana doz û berçavxistina têkoşîna rizgariya gelê me, wê 'Berxwedan' di xebata weşînî xwe li pirsgirêkîn girsên kedkaîen Kurdistan bigre. Parêzvaniya hevkârî û yekîtiyê bike. Ü ewê xwe bi piştgirtina têkoşîna gelê Kurdistan bi kar û bar bîne, xwe bi pergal bike. Berxwedan wê, bi piştgirî û hevalbendî ya refê welathez a bi parastina kedkarê Kurdistan, jîndar bibe. Berxwedan dê dengê me be!.. Hejmara yekemîn di Nîsana 1983 an de der çû bû.

gerilla, deşt û ciyayê Kurdistan, newal û deviyê Kurdistan nasnakin, nikarin weke wan bînne zimê. Berxwedan; li ser jiyan û bîranînen gerilla, salvegera şehîdbûna gerilla pirralî disekine. Ni-vîsîn gerilla, ji teref xwendevan tê-xwendin û xwendevan li ser vê jiyanê, şîr (hel-best)an dinîvisînin. Bi şêweyekî din ku mirov bixwaze bêje; Berxwedan navgînce, di navbeyna gerilla û gel de (ji awira weşanan).

Navenda Berxwedan

Em li derî dixin û dikevin salinekî fireh. Bi xêr hatina me tê kirin. Her li salônê odayek heye, em derî vedikin; xortekî zirav û dirêj li wir e.

Di salvegera rojnameya Berxwedan de, rojname xwe ji bo gavêñ xwirttir amade dike. 10 saliya Berxwedan li tevayê gelê Kurd pîroz bel

15'ê Tebax'ê 1984, demeke dîrokî ye. Di wê rojê de telefona Berxwedan qet ne disekinî. Bi sedan welatparêz û dayikêñ girtî û şehîdan, lê digerîyan. Deng û bahsêñ nuh dixwestin

Di 1983 an de 'Berxwedan' û Kurdistan

Ji bo ku rola Berxwedan ya dîrokî tê bête gihîstîn; pêwîst e em vegezin wê demê û hinekî li rewşa Kurdistan binêrin.

Piştî cunta leşkerî ya Tirkiyê; li Kurdistan ji bilî girtin, kuştin û zindanîkirinê pêve tiştek din tunebû. Bi zilm û hovîtiyê xwe dixwestin zindaniya bispêrin xwe û gelê Kurd, bi şeweyekî xerabtir, ji şexsiyeta wan derxîn. Lî  sîrîn şerê serxwebûnê; ev bê şerefi qet nepejirandin. Mazzum û Hayri û Kemalan bi canî xwe, çar lehengan bi agirê laşê xwe li dij van planan derketin û di zindanê de serî ne tewandin, serê wan dane tewandin û di zindanê de gotin "Berxwedan jiyan e", bi berxwedanê bi ser ketin. Heya sala 1983 an berxwedan berdewam bûn, her wiha li zindana Amedê, zilm û hovîti jî berdewam bû.

Berxwedan weke rojname mehane gava ku derket, ew bûbû zimanê gelê Kurd û zindaniyan. Her wiha agehdariyênuh dighandin xwendevan ku "ji niha û nêzîk de wê şerê xelasbûnê dest pê bi-ke."

Gerilla û Berxwedan

Nivîskarêñ herî xwirt weke



Rojnameya Berxwedan, Sal: 10, Hejmar: 145

xêr hatina me dike. Em dûre dizanin ku ew ne Kurd e, ew Tirk e. Em jê pîrsdikin; ew ji bersiv dide ku; "ev hêz ne hêza Kurdan tenê ye, hêza gelê Rojhilata navîne, hêzек enternasyonalist e. Hêza me ye".

Em derbasî odayeke din dibin, xortekî zirav û dirêj li wir e. Kurdiyek xweş dike, ku weke ya aliye Diyarbekir (Amed)e. Li ser mekîna nivîsandîn ye û hema dinîvisîne.

bixwin. Em tev dikenin û şerîniyê dixwin.

Di salvegera rojnameya Berxwedan de, rojname xwe ji bo gavêñ xwirttir amade dike. 10 saliya Berxwedan li tevayê gelê Kurd pîroz be!

15 Tebax 1984, demeke dîrokî ye. Di wê rojê de telefona Berxwedan qet ne disekinî. Bi sedan welatparêz û dayikêñ girtî û şehîdan, lê digerîyan. Deng û bahsêñ nuh dixwestin!

'Berxwedan' heya sala 1987 an, her ku şer bilind dibû bersiva demê ji bo ku bide; carna pirtük, carna hejmarêñ taybetî derdixistin. Lî piştî demekê, ev tişt jî nema têr kir. Di roja 15'ê Mijdara 1987 an de, Berxwedan bû rojnameyek du hefteyî

Dûre çend kesen din tê, peydé çend kes û din tir tê... Li ser rojnamê disekinî; li ser nivîsandîn, lêkolîn û hwd. disekinî.

Dengê derî tê, hinek mîvan tê. Yek ji wan mîvana jin e. Ji nav poştekê, sîniyekê derdixe. Di sîniyê de Beqlewe heye. Dibêje "Beyî we ev şeranî di ber me ve neçû, min anî vir; werin em bi hev re

Berxwedan heya sala 1987 an, her ku şer bilind dibû bersiva demê ji bo ku bide; carna pirtük, carna hejmarêñ taybetî derdixistin. Lî piştî demekê, ev tişt jî nema têr kir. Roja 15'ê Mijdara 1987 an, Berxwedan bû rojnameyek du hefteyî. Di wan deman de wiha gotibû: "Şerî Serxwebûn û azadiyê bi gavêñ pirr mezin bi pêş dikeve. Ji bo ku bi awa-

ye kî bi hêzir em bibine dengê gelê Kurdistan û şerê xelasbûnê, dê ji niha û pê de emê bibine rojnameya du hefteyî. Bi xwendevanê xwe em dê xwirttir bibin!". Berxwedan heya niha bi zimanê kurdî (Zazakî, Kurmancî Soranî) û yê tirkî derdikeve. Li wir Alfabeya Hawar tê bi kar anîn.

Berxwedan organa Eniya Rizgariya Netewaya Kurdistan-ERNK ye. Ew pirek e ku ji nav gelê Kurdistan dirêjî nav şervanê ARGK dibe. Ew ziman, guh, çavêñ dayikê şehîdan, hêşîren şer, jînêñ welatparêz, huner-mendêñ welatparêz, rewşen-bîrêñ welatparêz, xorîñ welatparêz, zarokêñ welatparêz e.

Berxwedan rojnameyeke deng û bahsan e û fîkrî ye. Deng û bahsêñ cure cure tê wir û li wir, li ser wan tê sekinandin. Her wiha nirxandinê cure cure li wir tê kinîn û nivîsandîn.

Cihan

Li ser bûyerêñ ku li cîhanê diqewimin, tê sekinandin û li ser rûpelîn rojnamê bi nirxandinê cure curê tê weşandin. Li derveyî welat li ser pîrsê bi nirx, hevpeyvîn, lêkolîn têne amadekirin, têne weşandin.

Xwendevan û nûçevanê Berxwedan

Kurd li ci deverêñ cîhanê hebin, Berxwedan li wir e. Li teniştâ kul û kesera gelê xwe ye, zimanê wan e. Di salê de bi hezaran name tê navenda Berxwedanê. Li ser wan yek bi yek, tê sekinandin. Her roj xwendevan telefon dîkin an jî tê ziyareta Berxwedan. Ji Kurdistanê xelk gelek caran telefon dîkin an jî nameyan dişeynin. Xwendevan her ne Kurd tenê ne, gelê li mintiqê jî henin; weke Aşur, Ermen an jî Tirk. Ji wan re mîna xwendevan, bersiv têne dan û li ser nameyê wan tê sekinandin.

Nûçevanê Berxwedan, hingî gelek in; hejmara wan ne diyar e. Li hemû deveren ku Kurd lê hene, nûçevanê Berxwedanê jî li wir hene. Li Kurdistan heya bi gundan jî, ne bê nûçevan e. Ev tev dinîvisîn û bi sistema teknikî ya dawîn dîghêjînin destê Berxwedanê. Hinek ji wan li ser ekonomî, hinek li ser Kultur, ziman, dîrok, huner û hwd dinîvisîn û dîghêjînin destê Berxwedanê. Heya niha, di rûpelîn Berxwedanê de; bi sedan nivîsen Kulturî hatine nivîsin ku ev ji teref Rewşen-bîrêñ Kurd hatine nivîsin.

Zarê ku Memê Alan pê hatiye nivîsîn pirî bilind e, tê de wesfîn wisa spehî hene ku bi tenê di roman û trajedyen (eserên edebî, nemaze yêni tiyatrosu yêni dilêşand) pirr hêja de têne dîtin. Li wesfa Zînê ya raketî binêrin:

"Eniya gewr e, madena zêran e,

Biskêni bi rewa xwe berdane ser hinarike!

Biskêni qeter berdane ser gulyane, Xwe berdane ser textê piştê qolincane.

Taximekî hûr jê re wûnane,

Berdane ser pêşir û sepet û derziyane."

Ü wesfa giyanî ya Zînê, gava dibihise ku Mem hatiye Cizîre:

"Ji nuh ve, dilê wê rabû mîna behrane,

Pêlan xwe davêtin ji seri heya lingane,

Dîsa derd û kulan seri hildane,

Lê ne mîna berê, bê hevi ye ji hatina Memê,

Padişahê Kurdane".

Çeko bi xwe, piştî ku dizane Mem ji bo Zînê hatiye, li ber du birayê din rewşa xwe ya nefsi çi xweş derpêş dike û dibêje:

Destana Memê Alan (4)

Rewşa edebî



Bozê revan

"EZ Çeko me, ez ne ê û dev bi xwîn im.
dîn im! Eger niha sed mîr bi ser
Mîn a gurê çilê, zik birçî min de werin,

ez yekî di yê din nagihî-nim.

Ku bajarê Cizîre gişt li pişt wan be, dîsa ez xema giştikan nakişinim."

Wek sehneyêni tiyatrosu ji van salixdanan çêtir, di alemê gişî de kêm peyda dibin.

Eger em bigerin hîn tiştêne hêjatir dikarin peyda kin û bixîne ber çavêne xwendevanan.

Destana Memê Alan de, ji aliyê edebî bihayêngirantir hene. Ji mewzû yê evînê pê ve rûçikêne peyayê destanê û xwirtiya çîrokê ya dramatikî (wekî sekinandina du hêzên mîakîs: Hesen û Çeko, Mîr û Mem, Mem û Zîn û Beko, qeder û vîna însan) Memê Alan digehînin dereceya eserên nivîsarên cihan. Wek Homarê Yewnanî, Şekspîrê Ingilîzî, Rasînê Fransızî û Gote û şillerên Elemanî. Ji nivîsanêni van hunerbazêne mezin, ya

nêziktirê destana me Romeo û Julieta Şekspîr e. Qehremanen wê ji wek qehremanen ya me dilketiyen bextres in.

Her du rebenêni Romeo û Juliet, wek Mem û Zîn nagehin evîna xwe ya pak û bi agir, û dîbin qurbanen wê.

Qehremanen Şekspîr, ji bo yek û din xwe dikujin. Bi rastî em dikarin bêjin ku Mem bi xwe, bi awakî xwe dikuje.

Dizane ku di hinare de jehr heye, digel vê yekê wê distîne û dixwe.

Di destana Memê Alan de ne bi tenê baweriyen ola İslâmî, lê baweriyen pirr kevin ji dorêne mezin dileyizin.

Mem û Zîn bi destê perian hev û du dîbin û hez ji hev dîkin.

Romeo û Juliet, di karnawalekê de rastî hev tê û dîbin dilketiyen hev.

Koyo Berz

Folklor Botan-9

Beşîr Botanî

9-Stiranê zarokan

Hestêni dayikê li hevberî za-rokan xwe... xêzkurt e (setirkurt, beytkurt), xêzkêni e, bendhindik e û awaza wê na gehite oktavekê (kêmtir ji 8 deng) xwendina stirana za-rokan weke xwendina hel-bestan û bi lez, yan carna bi awazaka xweş û bi xweşî û henekan tête stirandin. Wisa bi dengekî nerm û zelal (weke Heyranokan).

Naveroka wê ji

1- Hestêni dayikê yên bê sinûr...

2- Ciwaniya zarokan û ji yê (emrê dirêj)...

3- Hêvi ji bo xweşîya za-rokan û pêşeroja wan...

4- û...

Ev naverok di gel stirandinê bûne pênasra stirana za-rokan, ya jinê bi hestêni (şîür, îhsas) xwe yên pirr bi evîn xemlandiye...

Ev stiran yan helbest li her malekê hene û gotin û awaza wan herdem têne gu-hertin. Mixabin e ku nayêne parastin.

Nimûne li nik min kêm in û hemû ji ber jina Kurd ya şermîn û nezan, ya ku dema wê ya vala nîne ku destê arî-kariyê ji min re dirêj bike...

Nimûne ji dayika min So-ra Botanî û bi arîkariya Bed-riya Cizîri.

1- Xudê mala te ava
Xanyê me ber bit tava
Ji xelkî bûk ji me zava
Xudê banê keremê
Te nivîsî qelemê
Şahyanet şûna xemê (Hîvan da şûna xemê)
(Hîvan navê zarokî ye, yan Azad, Nesrîn û...)

2- Heçî bêjît kirêt e
Dîwarek ser da bete
Dest bişkê û her du pête

(Hindek dibêjin ête.)

Heçî bêjît spehî ye
Rehme li dêbabê wî ye
Behîst her cihê wî ye

3- Lo dilo, lo dilo
Çûme mîrga Elyê silo
Lo dilo, lo dilo
Me giya çînî te kir milo

4- Şîrîn şîrîn navê te
Mûsil û Heleb nextê te
Cihê Botan textê te
Qayil na bit babê te

Razî na bit dayika te
Cihê Botan, Cizîra Botan
ji tête gotin...

5- Nimûneya pêncê min ji
jineke cihû wergirt û navê
wê mixabin e ku nayête bîra
min.

Navê mîrê wê Davîd
Lêvî, ew bi xwe ji gundê
Mirêba, yê ku nêzîkî bajarê
şêxan dikeve. Babê Davîdî
navê wî Mûsa (Moşê), ewî



Stiranê zarokan li her maleke hene û gotin û awaza wan her dem tê guhertin

gotiye ku mîrê Botan Kamîran Bedirxan carekê hatibû
Mirêba û ji folklorâ wî gun-dî seyrmayî (ecêbmayî) ma!

Xudê berî teala
Tu mezin ke mindala
Da biçne nav hevala
Xudê û ji bîr bike

Êş û jana dwîr (dûr) bi-ke

Dest û piya stwîr (stûr) bike

PÊNÛS

Amed Tigris

Kurmancî zimanê gundiyên me ye

Heta çend sal berê, ne bi tenê li gund û bajarokên (qezayê) bakûrê welatê me, herwiha li bajaran ji pirraniya xelkê bi kurdî qise dikirin. Ji xwe li mal jî ji bilî kurdî zimanekî din nedihate qisekirin. Jinê Kurd ji % 99 tenê, bi kurdî dizanibûn. Li sûkê, li çayxanan, di firotin û kirînan de, bi tenê kurdî dihate qisekirin. Heta di pirraniya daîrên dewletê de dengê kurdî dihate guhêñ mirov. Heta 10-15 sal berya niha, tê bîra min li bajarokê me, li Licê, kê bi tirkî qisebikira, hemûya pê henek û tinazên xwe dikir û digotin:

"Waxx, ev ci şildim-bildima te ye! ma bavê te jî bi tirkî xeber dida?.."

Memûrên Tirk ên ku dihatin Licê, bêguman hemû zarokên wan di navbera salekê de hînî kurdî dibûn. Dema wan bi kurdî qise dikirin, kesî nizanibû ku ew Tirk in, an jî zarokên Tirkan in.

Lê, hezar mixabin ew rewş niha li welêt, ji binî ve hatiye guhertin. Niha hemû kes nebin jî, lê pirranî li mal û sûkê, êdî bi hevdû re bi tirkî qise dikin. Heta ew malbatênu ku 10 sal berê ji gun-dan hatine bajarakan an jî yên ku ji bajarakan hatine bajaran, êdî ew bi tirkî qise dikin. Heta zarokên wan bi kurdî nizanin. Di eynî malê de, kal û pîr ji neviyên xwe fêm nakin. Ew bi tirkî nizanin û nevi jî bi kurdî. Dê û bav, di nav wan de tercumaniyê dikin. Ev trajediye gelek mezîn e. Mirov nikare vê trajediya han bi nav bike.

Rast e, dewleta dagîrker bi salan in, ku bi armancû programke mezîn û dijwar asîmîlasyonê daye pêş xwe. Hemû îmkanên xwe, di vî warî de bi kar tîne. Lê, em dîsa nikarin hemû sedemîn vê trajediye bikin stûyê dewletê. Em Kurd bi xwe jî, ji vê yekê súcdar in. Xwenda û ronakbirêne me, bi xwe, ji aliyekeve pêşengiya vê asîmîlasyonê dikin. Ew di bin psîkolojiya biçûktiyê de ne. Di bin tesîra propaganda Kemalîzmê de, ziman û kultura xwe qels û nîzîm dibînin. Ji netewebûniya xwe şerm dikin. Ziman û kultura Tirkan dewlemend, bilind û bi nirx (qiyimet) dibînin. Ji ber vê yekê, bi zarokên xwe re, bi kurdî qise nakin. Kultur û per-werda (terbiya) kurdî nadîn zarokên xwe. Tu normeke an jî nîşaneke Kurd û Kurdayetiyê di zarokên kesen wiha de tune ye. Niha jî rewşa pirraniya pêşew û ronakbirêne me Kurdish, li welêt, li Tirkîyê û heta li Ewrûpa jî wiha berdewam e.

Dîvî êdî serê me zelal be. Rewşa me zelal û diyar be. Bi ziman û kultura biyaniyan em serê zarokên xwe neşon. Hem Kurdbûn û hem jî Tirkbûn bi hevdû re nabe. Ma ev ne qûm û çîmento ye, ku mirov tevíhev bike û bike xerc. Mirov an Kurd e, an jî Tirk e. "Ez hem Tirk im û hem jî Kurd im." Ev li ku hatiye dîtin? Ev dîtin li dij qanûnên biyoloji, fizyoloji û sosyolojiyê ye. Li dij mirovatiyê ye.

Gava biyanî zimanê xwe hînî Kurdeki bikin

Li meha çiriya pêşin, 1991 an, du pirtûk li ser Kurdish, li Fransa, çap bûn: 1: William Eagleton Jr: Komara Mahabadê, Belçika, weşanîn Complexe, 1991, 231 rûpel; 2) Elizabéth Picard, Stéphane Yerasimos, Hemît Bozarslan, Stephan Marquardt, Xesan Selamê: Pirsa kurdi, Belçika, weşanîn complexe, 1991, 161 rûpel. Pê re, li meha Sebatê 1992, pirtûkeke din li ser Kurdish derdikeve: Gérard Chaliand, Bextresiya Kurdish, Paris, weşanîn Seuil, 1992, 212 rûpel.

Bi nîfîna me, girêdana van hersê pirtûkan ci ji nêzîk ve, ci ji dûr ve, wê bi hev re hebe. Hersê ji pirsa Kurdi li gor siyaseta Amerika (Sistema Nuh ya Cihanî) têye rîxistin. Ên ku ev pirtûk nîvîsandine xwestine pirsa zanova Kurdi derxînîne meydân û bixwînin. Herweki ev pirtûk bi awakî dijminane li ser Kurdish hatine çê kin, bi Kurdeki pîr pê zor e ku rabiştikî dirêj li ser binivîsine. Em naxwazin li ser armancêniyi siyasiyî yêvan pirtûkan bisekinin. Herweki propaganda van pirtûkan him li Fransa, him li Tirkîyê hate kirin, me xwest

em jî jehrê ji gungvu derxînîn.

Vêca, zanova Kurdi di herdu pirtûkî davî de hatiye xwendin û ên nîvîskar gîhiştine yek encamê: Kurdi-nîne. Kurdi-nîne ev e: Kurmanc, Soran, Zaza, Goran, Feyli, Ezdi, Ehli Heq, Heneff, Şafî-i, Elewi, Qadir, Neqîbendi, Sunî, hwd...

Pirtûka duymîn di bin serdarîya Elizabéth Picard de hatiye amade kirin. Jinikê zaniye ci kesan vebjîre da ku li ser Kurdish wekî wê xwestîye were nîvîsandin. Em naxwazin li ser nîvîskarê biyans bisekinin, ji ber ku tu heqê me li biyaniyan nîne ku-em ji wan bixwazin bila bi çeyî li ser Kurdish binivîsînîn. Paşî e ku xwestîye zanova Kurdi bixwîne hele ka Kurdi-heye, an tune ye Hemît e. Derbareyi herdu nîvîsanen Hemît de ku di wê pirtûkî de hatine çap kirin çirokek tê bîra me: "Kurdeki jî gundê Şadêrê, navê wî Hemedok, çû bû Cindrêse hînî xwendin û nîvîsandina Erebî bibe. Vêca, Erebîn Cindrêse berî gişî çûbûn xeber û gotinê pîs ku bi dêbavên xwe re bide li ber xistî bûn. Heftak neçû, Hemedok hate gund.



Ronakbirêne Tirkan û kultura Kurdi

Şerefxan Cizirî

Tevgera Kurdish ya neteweyî roj bi roj fireh dibe. Ev fi-rehbûn ji aliyekevî de polîtîk û ji aliyekevî de ji kulturî ye. Fi-rehbûna polîtîk bi xwe re fi-rehbûna kulturî jî avadike. Kultura Kurdi bala ronakbirêne cîran dikişine, muzik, helbest û edebiyata Kurdi dikeve naven-diya munqaşê. Ev rewşa nuh divê ji bo doza gelê Kurd baş bê bikaranin û Kurd kultura xwe ya dewlemend bi gelê cîran baş bide nasandin.

Em hemû dizanin ku kultura Kurdish heta niha bala ronakbirêne Tirkan ne kişandibû. Lê baş xwiyadike ku hêdî hêdî ev bê dengî tête şikînandin. Mînakekî baş di vî warî de, ji aliye profesor Server Tanilli de xwe da nîşandan. Li bajarê Stockholm bi navê "li ba Cegerxwîn û Ahmed Arif realite ya Kurdi", semînerek hate çêkirin. Semîner ji aliye Federasyona Komelîn Kurdistan ve li Swed hatibû organizekirin û di 20'ê Nîsanê de çêbû. Pirr kesen navdar weke nîvîskarê Tirk Demir Özlu û nîvîskarê Kurd Mehmet Emin Bozarslan, Mehmet

Uzun û hwd. beşdarbûn.

Di destpêka semînerê de Server Tanilli, dîtinê xwe li ser ziman û helbest bi awayekî vekirî got: Li gora Server Tanilli helbest û roman bi kijan zimanî bê nîvîsandin dibe malê wî gelî. Huner û ziman bi hevdû ve, ji nêzîk ve giredayî ne. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje ku Cegerxwîn Kurd e ji ber ku bi kurdî nîvîsiye. Ahmed Arif ji dikeve edebiyata Tirkan ji ber ku bi tirkî helbesten xwe nîvîsandine.

bîne. Di dîtinê li ser huner de pêwîst e mirov li motif û li rewşa polîtîk ya berbiçav jî baş binêre. Li vir em mînakekî bidin; Sebebêne ku gelek cara Kurdish bi farisî, erebî û tirkî nîvîsandiye, baş diyar e. Ji ber vê yekê mirov nikare bêje ku nîvîskar û helbestvanen Kurdish, ew e ku bi zimanekî cîran nîvîsînê, bûne malen edebiyata Ereb, Faris û Tirkan. Ez vê dîtinê rast nabînim.

Weke tê zanîn pîr nîvîskar û helbestvanen mezin berhemên xwe bi zimanê İspanî çapkiranê. Gelo, mirov dikare bi hesanî bêje ku nîvîskarê Arjantînî, Kubanî; Meksîkî û hwd, ji bo ku berhemên xwe bi İspanî dinivîsînîn, dîbin nîvîskarê İspanî?.. Ez ne di vê baweriye de me.

Gelek nîvîskarê Kurd berhemên xwe bi Tirkî nîvîsînê. Ji ber vê yekê mirov nikare bêje ku ew bûne edebiyata Tirkan. Bi baweriye min, dîtinâ Server Tanilli, di dawiya semînerê de hatin munaqaşekirin. Hinek beşdarê civînê daxwazkirin ku ev dîtinê pirralî bêne ronîkirin. Bi baweriye min, dîtinâ Server Tanilli di vî warî de çewt e. Çewt e, ji ber ku mekanîk e. Nabe ku mirov danûstandina ziman û helbest tenê yekalî bi-

pak nahêle!". Vêca, go "Hemît jî çûye hînî fransîz bûye!" De ka em binêrin ci li ber Hemît xistine"

a- Sernîvîsa gotara yekemîn li ser Kemalîzma Tirkan e, lê Hemît xwestîye nîşan bide ku Kurd Kemalîst in! (rûpel 38)

b- Dewleta Tirkî wekî cîranen xwe kok be kerta Kurdî nelîstîye da ku problemen xwe yêndî hundir çareser bîke! (r. 47)

c- Gerîllayen PKK 2500 kes ji millet di sala 1984 an de dane kuştîn! (r. 45)

d- Serhildanen Kurdish çê bûne ji ber ku Kemalîst li dijî din rabû bûn! (r. 37)

e- Kurd tim hez dikin xwe bidine kuştîn û bibêjin "şehîdî me", pîr ji tolvedan hez dikin (r. 98, 105)

f- Kurd nîzîn diplomasiyê bîkin (r. 108)

Gelo çawa Kurde dikare ewqasî bi neheqî li dijî millet xwe bi xwe bînîvisîye Bersiv bila ji xwendevanen re be.

Gérard Chaliand jî, ê ku berê bi başî li ser Kurdish nîvîsînê, xwestîye xwe nîşan de ku peyakî "camêr" e û rabûye "bersiva" van gotinê jorin daye. Di rastiyê de, tiştek neguhartîye, tenê gotinê bê edeb ên ku di pirtûka Elizabeth Picard de hatine, hilanîne, bi kar neanîne. Em dikarin tiştek bibêjin: ew dema ku Tirkîn Ciwanîne sozên biratîyê û miratiyê bidine Kurdish û paşê sozên xwe xwarine, ji hinekan re iro ew dema hanê xewneke şevan e!

Amed

Sous la direction de
ELIZABETH PICARD

La question kurde

Pîrsîgirêka Kurdi

g- Celal Talebanî Qadirî ye, Mesud Barzanî Neqîbîndî ye! (r. 104)

Hozanê Kurdan ê pêşîn ELÎ HERÎRÎ

Elî Herîrî, hozanê Kurdan yê pêşîn e. Ew li gundê Herîrî nehiya Şemdinan sincaka He-kariyê, di sala 1009-1010 de ji dayika xwe bûye û di sala 1078 an de çûye rehmetê û hemâ li wê derê hatiye çalkirin.

Elî Herîrî bi helbest û beytên xwe li Kurdistanê gelel tê zanîn û bi navûdeng e. Lî çi mixabin ji aferînek (eser) êl- "zan piir kêmê wî hatinê derskîrin û nivîsandin. Di kovar û rojnamenê Kurdi de carnan derheqa cî-war û wextê bûyîna ji dayikê, nivîsîne eşkere kirine. Lî agah-darê (malumat) din derheqê Elî Herîrî de di pirtûk û nivîsarê Kurdi de heta van salen paşin tunebûn, her bi tenê berê pêşîn Albert Sosin di berhevoka xwe de bi navê "Kurdische Sammlungen" (Petersburg, sala 1887, rûpela

278)" helbesten hozan Elî Herîrî çap kirine. Hunermend Qanatê Kurdo çend heb helbesten hozan Elî Herîrî di pirtûka xwe de bi navê "Tarîxa Edebiyata Kurdi 1, rûpel 57-64, Stockholm 1983" bi herfîn lafiniya Kurdi nivîsiye.

Ger hûn bibînin nalê eşq
Tenê li bom zarî dikan,
Her kes bianet halê eşq,
Bi hile dijwarî dikan.

Bi halê eşq baxîl bûbûm,
Her dem di dem zelil
dibûm,
Bê rîh û bê delîl dibûm,
Her kes bi xemxwarî dikan.

Hûn bar nekîn xemîn di
zor,
Li hesreta wardîn di sor,
Çavê di reş bisk têne dor,
Eniya bi nûr tarî dikan.

Mest û şerab qendavê,
Esîr û bendêt vê şevê,
Ger wesfê yarê ez bibêm,
Hûn terkî buşyarî dikan.

Baxê ku sedbihar lê,
Bilbila lalezar lê,
Ku sed gulê bi xar lê,
Bilbilê nale nale.

Ji Hindê bînin teracî,
Ji Mermerê bînin xeracî,
Ji Romê bistînîn bace,
Ji bo xemla şepale.

Dema xalê di hûr lê,
Eyna zîlfât stûr lê,
Rû niva guhê tûr lê,
Mehbûbe bê mîsal e.

Ji Hînd bînin talanî,
Bikin gîlê sibhanî,
Ji bo çavê şâ-siltanî,
Dema bêtin ser sale.

Bi şahê wan dan û kerem,
Xizmet dikan Tîrk û Ecem,
Mirîdê eşqê dem bi dem,
Li nexşê ceharê diken.

Serdarî şaha rewneq e,
Mue'ciza remzeti ebleq e,
Elî û nebêjê ehmeq e,
Li bazari înkâr dikan.

Malmîsanij: Folklorê ma ra çend nimûney

Hêlinij û Amed

Zazakî lehcanê Kurdi ra yew lehca muhim a. Ganî zav xebat ser o bibo. Ma vanî qey cawo ki nuştox û rojnamey Kurdi danî bere bes niyo. Çindi ziwan û zaravanê Îranî kî rî wendîş, endi zî kokî jî-nî sereşinêno. Semedo ki ziwananê Îranî pênc nêhamay wendîş, heta inka ziwanê Avistî baş nêhamo şirove kerdiş. Tena çindi qalî Zazakî Avista di vejînî nûsenî: Hûrma, ber, keynik, veynayış, şiyayış, varan, zi, enî, heta peynî.

Îni eşmanê peynîyan di Malmîsanij yew kitabo folklorî yo erja çap kero. Weşanen Jîna Nû Siwêd di kitab vila kerd. Yew kara erja ye zî ay o ki kitab di Zazakiya şaristananê Çêrmûgî, Çewligî, Dêrsimi, Gêl, Hêni, Liji, Maden, Pîran, Palo, Motkî û Siwêregi hameya nuştiş. Karo ina sarêne geleki beranê asanayışî kî rî akeno û verdeno ki xususiyatê Zazakiya her şaristanî bizani. Faydey inî kari Zazakiya tena rî niyo, labrê Kirdkiya Corin û Çêrin rî zî beno. Ganî folklorî Kirdki lehcan pêrînî inawa bêro arê kerdiş.

Ino kitab di bara karê tanê embazanê bînan zî esta. Îni embazan tanê zî: J. Espar û Harûn, Nûra Cewarî û Zozan Ozmanî nota gelekî de-yîran nuşta. Tanî karê Zilfi,

Brûsk, Koyo Berz û Usxan zî tê di ca gitroto.

Ino kitab çindi barey ca gêmî; deyîrî, vatey verinan, estanekî, mertalî, zewtî, du'ay û qisey dileti. Zanayîşê ma gore, ino kitabo yewin o ki herahera folklorê Zazakî ser o nuştiş. Kitabxaney Kurdi yo dewlemeden folklor o. Çindi kî bisînhi, ganî kî folklor arê ki. Kinaro bîn ra, hemahema teşîri ziwananê xerîbo foklorî ser o çino. Nuştoxê Kurzav ray bin teşîri qaidey ziwanê xerîb di maneno. Folklor eyniyo xiş o ki şîno kî bin inî tesîr ra vejo.

Yew karo muhim o ina sarêne ki Malmîsanijî kero bê overvatiş nêbînî. Malmîsanij ino kitab di gelekî vatisî qelema siyay rey di nuşti. Eger inî vatisî şerih bîbînî, ka zav baş bo. Labrê şerhî jînî nêbiyo. Wayirê kitab estanekî hîri beşî kerda; ja ra vatisî ciyay zî vatî; estaneka civakî ra vato "estanek"; es-

arêkerdox: Malmîsanij
FOLKLORE MA RA
CEND NUMUNNEY

JîN Weşanen Jîna Nû

taneka hiweyişî ra vato "mesley û fiqrey"; estaneka zeri ra vato "hîkayey hesekerdişî". Ma nêzanî ci rî estanekî enawa parce kerda. Ina ser o zî overvatiş di bîmeynî vatisî, ka baş bo.

Ma ino kitab ra wendoxanî yew deyîrî vîjnene:

Xumxuma silêmanî

Xumxuma Silêmanî
Ca çînyo lewê panî
Wa vindro şewda roşanî
Hela şanî tarî ya
Bejna Xumxum barî ya

AZADÎ

Abdurahman Durre



Gur û dûman

D emirel, van rojan dîsa ci tê ber devê wî dibêje. Geh dibêje, ez ê bibirim, koka wan bînim, geh jî dibêje, ez ê demokrasiyê bînim. Di rojnameya Cumhuriyetê tarixa 24 ê meha Nîsanê di rûpelê 16 an de jî gotineke wî ya wiha heye: "Bağımsızlık haretlerinin öncüsüüz." Yanî, em, rîber û pêşîvanen serxwebûnan in, hemû xebat, şoreş û rewşen serxwebûn û azadîye destek dîkin. Ev pir gotineke girîng û mezin e. Ku rast be pirr bi rûmet e, belê ku derew be jî, pirr dereweke mezin e û pirr jî şerm û fedî ye. Ji bo ku em rastî û derewiya wî bizanibin, divê em vê pirsê bikin, gelo Demirel ji dil dibêje an tinazan dike? Eger ji dil dibêje, çîma li hemberê mafen Kurdan û televîzyona bi zimanê kurdi derdikeve? Em pirseke din jî, ji serokwezirê rîber dikan; gelo Kurdîn Iraqê, ku îstîqlal û serxwebûna xwe bixwazin û ilan bikin, wê serokwezirê hêja, ji wan re jî bibe pêşîvan û rîber? An wê bi firoke û virokê xwe êrisê bibe ser wan.

Ez ji zat ê muhterem re vî erz bikim ku rîberî û pêşîvanî, bi virr û derewan nabe û nameşe. Divê ku mirov zirtan nede xwe, tiştîn neke nebêje, hem jî divê, ev tiştîn ku mirov ji xwe re dixwaze, ji hevalen xwe re jî bixwaze..

Te gurê pîr (Türkeş) daye kîleka xwe, di nêzîk de dixwazî herî nav soydaşen xwe yên Qafqasyayê. Rêberiya xweş nîşanê wan bidin, gelek gale galên mezin bikin û heqê we jî heye. Divê hûn vê rastiyê jî bibînin ku gelê Kurd jî gelekî bindest û mezlûm e, dest avetiye şoreşa azadî û serxwebûna xwe, mafen xwe yên in-sanî û demokrasiyê dixwazin, divê ku hûn ji wan re jî, alîkarî û rîberî bikin, ne hovîti û berberî. Di demek de we digot "ew jî Tîrk in", niha hê jî gurê pîr wisa dibêje. Belê Demirelê şareza dibêje: "Kürt kökenli vatandaşlarımız." Hûn bi kîfa xwe ne, ci navî lê dîkin hûn dizanin. Em xwe, navê xwe û dîroka xwe rind dizanin, dinya jî me rind nasdiye, hûn ci dibêjin, bêjin. Belê daxwaz û xwestina me ew e ku, em êdî hev nexapînîn, em ji hev re wek bira bin ne wek gura bin, ci tiştîn ku ji Tîrkîn Qafqas, Asya Navîn û Qibrîsî re dixwazin, ji Kurdîn Kurdistanê re jî bixwazin. Biratî, rîberî û demokrasî wilo dibe. Wekî din zirt û virt in, virr û derew in.

Gotineke pêşîyan heye, dibêjin: "Gur, li rojekî bi dûman dîge-re." Serokwezir, dîsa dixwaze ku bibe hevalen guran, bi wan re here nêçirê. Belê ûroj sayî ye, dinya jî ronahî ye, ne ewr û tarî ye. Hişê xwe rind bîne serê xwe, tu vê carê jî şewqa xwe bidî destê xwe û herî, êdî tu qewet, te jî destê dadgeha dîrokê xelas nake. Ez dixwazim ji we re çirokekî bibêjim, (ku di baweriya min de hûn bi xwe jî bûne çîrok). Dibêjin: "Marekî, bi kurê bexçevane-kî vedide û dikuje, bavê lawik bi dû mar dikeve, wî diqefilîne û bêrekî lê dide, poçika mar diqurêfe (jîdike). Lî mar xelas dibe. Di ser de çend sal derbas dîbin. Rojekî dîsa, ev mirov mar dibîne, dixwaze ku wî bixapîne, keysê lê bîne û bikuje. dibêjiyê, maro were em bibin birayê hev, dev ji dijiminayetiye berdin. Mar dibêje, ez ji te re tiştîkî bêjim? Heta kuştîna lawê te û jana poçika min were bîra me, em nabin birayê hev.

Divê, em lez bikin hê ku rewşa me jî nebûye rewşa mar û bexçevan. Eqil û hişê xwe bînin serê xwe, hê ku dem zû ye, ne dereng e. Bi zilm, zor, virr, derew, dek û pîlanan demokrasî û biratî nabe. Ji dewra Osmanî heta ûroj, ev bû çend sedsal, bi dek, dolab, virr, derew û pîlanen cûrbecûr, Kurd û Kurdistan hatiye perçiqandin, hatiye xapandin, cerd, talan û qetşiam lê hatine kirin, hê jî ev rewşa zalim didome.

Lê belê heyhat û heyhat, êdî dawiya virran hat. Divê ku em bi rastî ji hev re wekî bira bin ne wekî mar û gura bin. Ez nizamîn, gelo we rind sehkir? Türk kökenli vatandaşlarımız!..

Tîleka tembûrî ye
Xumxumê, to rê vana

To rind a co rê vana

Tî ar bê ez nêvana

Qedra to ez bo zana

Estanê to ez nêvana

Xumxuma Silêmanî

Şekerê ser dukanû

Loxmeyê bindê ziwanî
Ca çînyo lewê panî

Wa vindro şewda roşanî

Xumxuma Silêmanî

Ca berî serdê banî

Hol ki kulikê orxanî

Ez bivînî ê ganî

A geyren serdê banî

Rojekê marek leqaî rovî-ye kî dibe. Silavan li hev dîkin. Pirsa hevdû dîkin. Mar çavên xwe kûr dike û li rovî dinêre. Jê re dibêje "Birayê rovî, were ez û tu em bibin deste bî-rayê hev. Di rojêng teng de alîkariyê bi hev re bî-kin. Tiştên qeweta min gihîştê ez bikim, tiştê ji te hat tu alî min bike. Em jîna xwe wisa bi rastî bi hev re bimeşînin. Ji xwe sibê roj emê tev bimrin. Hinek tişt hene mirov pê nikare. Bi yekîtiyê mirov kare bi her tiştî û zoriyê tim derbas bike".

Rovî "Ser serê min. Welle birayê mar madem tu ji dilê xwe vê yekê dixwazî herçî ez nabêjim na. Bi vê yekbûnê kes bi me nikare. Tu bawer bikî ji alî min de ci ji min bê ezê bikim."

Kêfa xwe tînin, xwe li hev dipêçin ehd û peyman didin hev. Dimesin dicin. Tê ber çemekî fi-

Biratiya mar û rovî

reh û pîrr kûr. Mar bala xwe dide çem û berê xwe dide rovî dibêje "Birao welle tu dibînî çem pîrr fireh e. Ez bawer nakim karibim lêdim. Ku tu bi awayekî alî min bikî ezê pîrr şanas bibim." Rovî dibê "Ser çavan. Ka ez çewa karim alî te bikim?

Mar "Ku tu bihêlî ez xwe li stuyê te bipêçim, emê karibin derbas bibin."

Xwe li stuyê rovî dipêçê û li avê didin. Çem fireh e û gellek pêlén wê hene. Rovî bi zor û heft bela di avê de ber bi xwe dide. Tê nêzîkê nîvê avê, mar tewen xwe hêdî hêdî dişidîne. Rovî dibêje "Birayê mar ji xwe gellek pêl hene û tu jî tewan dişidînî ez dikim bifetisim.

Mar "Birao welle ez ji



pêlan pîrr ditirsim!"

Rovî dinêre ku çiqas diçin mar tewen xwe yekcar dişidîne û hizir dike ku niyeta mar ne baş e. Jê re dibêje:

"Birayê mar ez pîrr westiyam. Çem pîrr fireh e, kûr e û bi pêl e. Bawer ke ezê nikaribim tevî bi qedînim. Bîna min çiki-

ya ez ditirsim ez bifetisim. Lî madem em bûne dost ez naxwazim kulek di dilê min de bimîne.

Mar "Wî! Birayê rovî xwedê kulan nexe dilê te de. Ci dixwazî?". Rovî "Me destê biratî delal da hev. Ku di deverê wiha de em bi kêrî hev bê. Lî em çawa bikin xwedê nekir qismet. Belê min carêkê binê qırka birayê xweyî mar maçî bikira ji xwe mirin emrê xwedê ye."

Mar "Bila be birayê rovî, ser çavê min. Bila kul di dilê te de nemîne. Jê û rehettir ci heye."

Mar serê xwe ji ser stuyê rovî xwar dike tîne ber devê wî dibêje "Ha birayê rovî bila ev kul dilê te de nemîne."

Rovî yek tell dibê qırç! Diranên xwe di qırka wî

de rûdinîne stûyê wî dixe devê xwe û dişidîne. Mar jî tewen xwe li stuyê wî dişidîne. Ew çiqas tewen xwe dişidîne rovî jî qırka wî dişidîne. De ji rovî de ji mar, de ji rovî de ji mar... Welle rovî mar difetisine. Mar ku difetise hêdî hêdî tewen wî sist dabin. Bêhna rovî dertê. Mar di devê wî de û rovî çepila dide û tê qerexê avê.

Ji avê derdikeve hinek bêhna xwe derdixe. Tîne mar li ser silekanê dirêj dike. Tê ji alî serî de lê dinêre heya dûvê wî cihêñ xwar rast dike. Ji alî dûv de jî lê dinêre heya serî cihêñ xwar mabin wan jî rast dike. Bala xwe dide ku ji herdû aliyan de jî mar rippî rast bûye. Tê li ser serê wî li piya disekine û dibêje: "Qeda li wê biratiyê be ku ne wisa rast be..."

Berhevkar: Rûken Baxdu

Gava agir bi daristanê dikeve

Perde 2.

Qehwexaneyek e û li wir hinek mase henin. Li ser maseyekê Simko bi çend kesan re rûniştiye. Yek ji kesen rûnişti, ji simko ga-zinan dike.

Ehmo: Simko, em pis-mamê hevûdin in. Bi rastî ez ji ber te fedî dikim. Birayê te şehîd ket, te bazda! Ma ne eyb e kuro! Te xebet hiştibû ku, tu çûyî En-querê! Ev ci derew in!

Simko: Ma ez weke we dîn bûme! Ez nikarim bi we re biggerim. Ma dewlet dîn e. Ew, bi hemû tişti zanîn! Ma min ci ji we ye! Hûn bêne kuştin ji, ez eleqê xwe, ji we naynim!

Bi carekê re grûbek leşker, bi çend polîs û serleskeran ve dikevin hundir. Bi dengekî berz "Herkes kimliğini çıkarsın, kimlik kontrol". Serlekerek ber bi maseya wan ve tê. Li nav çavê Ehmo dinere.

Serlekerek: Sen Ehmo denilen kişi değil midin, lan? (çend kulma lê dixe. Berê xwe dide leşkeran) Alın bu eşek oğlu eşegi!

(Leşker bi milê Ehmo digrin û dîbin derive. Serlekerek berê xwe dide Simko û jê dipirse) Tanıyor-



muydun lan Ehmo yu? Yoksâ onun arkadaşı falan misin?!

Simko: Yok valahi komutanım! O bana kaçak tutin satmak istedî. Ancak, ben ona devletin kaçak etiği şeyleri almam dedim. Valah tanımıyorum onu! İyi ki kaçakçılara yakaladınız. Devletimiz varolsun."

Serlekerek ji cem wî diçe. Leşkerek tê û li nasnama (kimlik) wî dinere. Hinekî li lîsta di dest xwe, carna jî li ser çavê wî dinere. Bi xwe bawer nabe û diçe cem serlekerek xwe.

Leşker: Komutanım

listedeki adamları aynı adları taşımaktalar ve aynı soyadları var. Lakin doğum yerinde sadece degisiklik var. Ne yapalim?

Serlekerek: (Nêzî Simko dibe û hinekî dikene) Bili-yordum! Zaten gözüm pek tutmamıştı bunu. Bunlar nüfus memurunu bile satın alabilir! Alın götürün...

Simko: (leşker radjin milen wî dikşînîn, ew jî bi hawar û tika) Komutanım valahi, ben değilim. Ben dosyam temizdir! Kom....

Perde 3.

Bijî mirina bi namûs
Hücreyeke cihê işkencê ye. Du serlekerek li wir in. Bi hevre dipeyivin.

Serlekerek 1: Demek Simkoyu konuştaramadınız ha...

Serlekerek 2: Malesef komutanım. Adam nere-deyse kendini melek gibi suçsuz ilan edecek. Ancak bütün halkı örgütleyen tip-lerdendir. Ne düşünelim?

Serlekerek 1: Böyle tehlikelilere her zaman yaptığımız gibi!..

Herdû derdikevin derve. Piştre Simko di lepen leşkeran de ye, wî diavêjin



hundir û derdikevin. Simko radibe ser xwe. Li dora xwe dinêre.

Simko: (Ji xwe re) Vir cihê ci ye! (li dora xwe dinere. Xwîna bi dîwîr ve dibîne) Li vê deverê berî min hinek kesen din jî hebûne!.. (bere paşve tê û çavên wî bi hêstir dibe. Bi carekê re çav bi çend pêlavêne ne ferê hev dikeve) Pêlav!.. Ne ferê hev in. 1,2,...3,...4,...5..., na ez naxwazim bîrim. Ez bê súc im. Ez naxwazim weke xwediye van pêlavân bême kuştin. (bi carekê re disekine) Leheng, ji min re gotibû "Tê rastiyê bibînî, lê wê bibe dereng, ne-

yar gava dikuje, herkes dişewite. Gava agir bi daristanê dikeve, terr û hişk tevde dişewite". Eyşê jî di-gote min... Bi rastî ez bê xîret im... dawiya bê namûsiyê tune!.. Niha kes nayê ser tirba min, ser ce-nazê min... (bi qîrandin) Ez bê xîret im! Ez ne mirov im! Kesê ku li ser şehîdan negrî, dilê wî li ser welatê wî neşewite, ne mirov e! (Bê deng dimîne, di-çe û tê û bi ken û girîn, carna bi qêrîn carna bi ner-mî) Na! Na! ez naxwazim bi bêxîretî bîrim. Roja namûsê ye! (bi dengê berz) Her bijî Serxwebûna Kurdistan!.. Bijî serîhilda-na gelê Kurdistan!.. Bijî, her bijî Mazlum, Hayri û Kemal!..

Bi carekê re leşker dikevin hundir. Lî dixin! serlekerek tê û bi dengekî berz "Biliyordum bu teroristler, temizleyin ibneyi!" Hemû lê tên hev, Simko jî li berxwe dide, li wan dixe. Lî serlekerek, bi çek wî dikuje. Berî ku bimre, ji bo cara dawîn serê xwe bi zorê ji erdê radike "Bijî mirina bi namûs!.."

Amedekar:
Mihemed Gernas

Gelê Kurd bi serkevtinan bersiva bîranîna şehîdan dide

Mele Evdilayê Xerzî ji bîr nekin bidin ser riya wî

Nedim Dara

Gelên dest bi meşeke rizgariyê kirine, her demê şehîden xwe tînin bîra xwe. Gava domaneke nuh destpêdiye jî, ev bîranîn dihiye taybetiyênuh.

Heya niha di nav rîzêne têkoşîna me ya rizgariya neteweyî de gelek şiroveyen berfi-reh çêbûne. Ji van nêzîkbûna ber bi bîranîna şehîdan ve ji ber xwe tê xwiya kirin. Di dîroka gelan de jî şiroveyen weke li welatê me, li ser şehîdan hene. Şehîden pêsemîn rûberê şirove-kirinên berfirehtirin dibin. Çima? Ji ber ku şehîden pêsemîn jiyana xwe dikin hevîre dozê. Di dema şehîden pêsemîn de, hîna doz boş berfireh nebûye. Doz, hîna nebûye malê partîyan, gelan an jî mirovan. Pirraniya mirovan hîna wateya şehîketi-nan nîzanîn, heyâ gelek jî dikevin nava tîrsê. Ji lewre dema bûyeren şehîdbûnan baş neyîn têgihîstîn, hingê mirov nîzanîn çawa bersivê bidin, ci bikin. Ji aliyê din ve gava bersiva vê pîrsê neyê dayin jî, tehlûkeya bêbextiyê derdikeve holê. Yanî mirov piştä xwe didin dozê.

Şop-ajoyen şehîden pêsemîn, mecbûr in ku xwe bidin meşeke layiqê şehîdan. Tevgereke mirovahî ya mafdar wiha ava dibe û dest bi têkoşîna xwe dike. Lî divê mirov vê pêşveçûnê ne tenê mîna tevgerekê bizanibe. Berî her tiş, wateya meşa mezin divê were zanîn.

Di domana faşîzmê ya 12'ê İlonê de, tîrs û bizdanek xwe serdest kiribû. An divabû têkoşer teslim bûbûyana yan jî li dijî faşîzmê li ber xwe bidâna. Ji bo berde-wamkirina tevgereke rizgariya neteweyî, ji bo li ser lingan hiştina neteweyî, ji bo pîrozahîya mirovahî, divabû berx-wedan bilind bûbûya. Sistiya di berxwedanê de, dikaribû bîbe sedama ne tenê bêbextiyê; her wiha sedema şikestina parti-yekê, milletekê jî. Di tariya faşîzmê de mirovahî wê teslim bûbûya. Ji lewre divabû mirin bi xwe jî di riya berxwedanê de bana. Çareya tenha ev bû, divabû bingeh wiha hatibana da-nîn. Ci girîng bû? Mirovahîye zana ku tu caran teslim nabe!

Şehîd, bingehêni
jiyana Kurdan e

Di destpêka têkoşîna me ya rizgariya neteweyî de, şehîden me ji ber jariya tevgerê hene. Di demen wiha de her tiştek bi lez û bez e. Şaşî gelek in. Her tiştek hîna ronahî nebûye. Di rewşekê wiha de bûyeren şehadetan çedîbin. Lî weke me gotî, gava kîmasî werin hilanîn, her tiştek were ronahîkirin û mirov xwe bigihînin serpilkeke pêşketî, serkevtin jî destpêdi. Ev jî dibe bersiveke baş di riya bîranîna şehîdan de.

Rêkxistîneke têkoşer û cenge-war wiha pêşvedice û xwirt dibe. Her mirovekî welatparêz, gava rêkxistîne xwirt tir bike, xwe û rewşa xwe ronahî bike, kîmasiyê xwe bizivirîne jêhatibûnan û di vê riye de bibe xwidiyê xebateka bê dawî û bê westan, hingê dibe layiqê şehîden welatê xwe. Heya niha bi hezaran mirovîn me xwe bi vî rengî îspat kirine. Ji lew re jî piştî her şehidekî, komeke girêdayê şehîdan avabûye û xwe avetiye nava agirê têkoşîne.

Her şehidekî me lehengekî dîroka me ye. Li ser jiyana her şehidekî, di cih de ye ku destanek were nîvîsandin. Ji ber ku ew evîndarêni jiyânê bûn, ew ji jiyânê nedîtîrsiyan. Ne bê gûman û hêvî bûn, lê dîsa jî riya jiyânê di mirinê de hilbijartîn. Kesêne piştî çend rojan, berî rojekî jiyana azad dixwestin û bi vê evînê tijî bûn, di kozen-bêbext de, di xewneke tarî de şehîd ketin. Gava çar dorêni wan hatin pêçandin, bi carekê rûmeta jiyana mezin kirin hûnera xwe. Jiyana rûmeta mezin hilbijartîn û xwe nedan destê dijmin. Xwe gihandin payedariya lehengî û keleşiyê.

Zivistanâ vê salê gelek dijwar derbas bû. Zivistanekî wiha hebû ku di sed salan de carekê, dikare were dîtin. Li beramberê zivistanekî welê dijwar, şerekî li ser lingan mayinê hate bilind-kirin. Lî şehîden me yê vî şerê xweragirtinê jî hene. Dijmin dixwest di vê zivistanê de xwe serdesttir bike. Lî têkoşer jî li beramberê wî li ber xwe dan. Xwe nekirin daxwazkarêن hoyen' hesan. Di encamê de gelek têkoşerên giranbuha man di bin aşûtîn berfî de û tevlî kaiwanê şehîdan bûn. Ey tê kîjan wateyê? Di zivistanê de, di nava berfî de berde-wamkirina wezîfeya xwe tê kîjan maneyê? Diyar e, ku têkoşer di vir de wezîfeya xwe li ser tiştekê bilindir ditine. Di pirsa delametê de, bi cih anîna wezifeyan, havîn û zivistan tune ye; ev hatiye îspat kirin. Ji niha û pêve wê baş bi-zanibin, ger germa havînê be, ger jî sermaya zivistanê be, gi-ringî mirov xwe ji delameta xwe bi dûr ve neke; di bin hoyen' zortîrîn de jî mirov li ser kar û xebata xwe bîmine.

Şehîd, mezin
Mele Evdilayê Xerzî

Di dîroka me de şehîdbûneke roja 2'ê Sibatê sala 1992'an heye. Heke mirov bixwaze baş li vê şehîdbûnê hûrbikole, divê mirov bi gotina "şehîd" jî têr nebe.

Mele Evdilayê Xerzî (Mele Evdilehmane Timokî) şehîdekî gelê Kurdistanê yê gelekî mezin e. Melayê me xwediye taybetiyê dîrokî ye. Temenê wî ber bi 100 salan ve diçû. Temenê wî



Mele Evdilayê (Evdilehman) Xerzî

ji dîroka komara Tirkân dirêjtir bû. Komara Tirkîyê bîrdoza (ideolojiya) xwe, ramyariya (politîkaya) xwe, sazî û sazyîn xwe pêşvebirîye, lê ci caran nekariye wî ber xwe ve bîne. Jiyana wî dibe dij-rabûn û serfîldanek.

Divê em serinc û bala xwe baş bidinê: Komara Tirkîyê di dîroka xwe ya 70 salî de seriyê pirraniya serekîn êl û eşiran, axayan û pêşajoyen olî yêne weke şexan tewandiye. Mirov dikare bibêje ku yêne neketibin vî halfi nemane. Heya ji aliyê çînî ve jî, birrekî ku tunekirina neteweyî nepijirîne, înkârikirina gelê Kurd nepijirîne nehiştine. Behsa birrekî rewşenbîrên li welatê me tê kirin. Lî rewşenbîrên di van hoyan de derkebûn holê, li ser bingeha înkârikirina Kurdan û welatê wan, li ser bingeha îxanetê derketibûn. Heya ava hestûyên xwe bi dîrkeran ve girêdayî bûn û çêtir were gotin wan temsil dikirin. Ji lew re ne rewşenbîriyek, tarîbûnek bi rî ve ketibû. Neteweyek bi giranî û pirraniya xwe noqî tariyê dibû. Eslê xwe înkâr dikir, welatê xwe înkâr dikir, kesaniya xwe înkâr dikir. Ne tenê ev, dînê xwe jî, îmana xwe

jî înkâr dikir û di vê riye de heya dawiyê ber bi tariyê zîlümât nebas di avê de diçû. Tu caran nedîfikirî çîma vê çendê hatiye nîzmkirin, vê çendê ketiye û vê çendê rezîl û riswa bûye. Pêsemîn di salen dawiyê de gelek kes ji Kurdan, dixwestin bêyî ku keferatekê bidin pêşya xwe dewle-mend bikin, malbata xwe bigihînin hal-xweşiyê, xwe bi mea-şekî dewleta dagirker girêbidin. Belê, di bin navê xwe xilaskirinê û xwe gihandina refahê de wiha xwe diavetin nava tariyan, şeref û rûmeta xwe erzan û nîzîm dikirin. Pirraniya Kurdan ketibûn nava hawîrkan-ka (yaris) riswa, lê vê xefleta xwe jî mîna mezinbûnkek, mîna serbilindiyekê dihesi-bandin. Li beramberê van rastiyen Mele Evdilayê Xerzî bi zanabûn xwe tevgerandîye, rewşê baş dîtiye û rûmeta xwe parastiye. Her çendî tiştek di destê wî de nemaye, ketiye nava rewşekê ku edî nikaribe jiyana xwe bidomîne jî, kariye xwe li ser lingê xwe bigire. Belê ew şexsiyetkî wiha piroz û bîlind e.

Partiya Demokrata Kurdistana İraqê-PDK-I heye, saziya bi navê Mele Barzanî heye. Ev parti dest diavêje kesen wiha. Wan ji xwe re dike piştigir û destikên xwirt. Melayê me yê welatparêz jî biqasî 50 salan bi vê partiyê re dimeşe, bi kîmasî piştigiriya wan dike. Heya dixwaze di nava rîzêne gelemerî yê partiyê de bîmîne. Gava di roja 12'ê İlonê sala 1980'î de faşîzm dest datîne ser rejîmê, Mele Evdila jî dixwaze hindekî rasttir berê xwe bide rejîmê û çêtir bimeşe. Li hêvî û benda tiştina dimîne, dixwaze tiştin çebîbin. Lî dinêre ku ixanet li bîr û baweriyan, li keferata salan tê kirin. Di wê demen de pêşengî PDK-I xwe avetibû bextê İranê. İran, li wir dixeblete ku wan li dijî gel bikarbîne. Ji bo nebe hacet vê leystokê, Mele Evdila li ber xwe dide. Her çendî 50 salan xizmeta wan

kiribû jî, gava dibîne kedîn mezin bi destê pêşengîye geleki nebas di avê de diçû. Tu caran nedîfikirî çîma vê çendê hatiye nîzmkirin, vê çendê ketiye û vê çendê rezîl û riswa bûye. Pêsemîn di salen dawiyê de gelek kes ji Kurdan, dixwestin bêyî ku keferatekê bidin pêşya xwe dewle-mend bikin, malbata xwe bigihînin hal-xweşiyê, xwe bi mea-şekî dewleta dagirker girêbidin. Belê, di bin navê xwe xilaskirinê û xwe gihandina refahê de wiha xwe diavetin nava tariyan, şeref û rûmeta xwe erzan û nîzîm dikirin. Pirraniya Kurdan ketibûn nava hawîrkan-ka (yaris) riswa, lê vê xefleta xwe jî mîna mezinbûnkek, mîna serbilindiyekê dihesi-bandin. Li beramberê van rastiyen Mele Evdilayê Xerzî bi zanabûn xwe tevgerandîye, rewşê baş dîtiye û rûmeta xwe parastiye. Her çendî tiştek di destê wî de nemaye, ketiye nava rewşekê ku edî nikaribe jiyana xwe bidomîne jî, kariye xwe li ser lingê xwe bigire. Belê ew şexsiyetkî wiha piroz û bîlind e.

Bi hebûna xwe şerefeke pirmezin dîda şervanen. Wan xwirt tir dikir. Kesêne wî dîtibin, van rastiyen baş dizanîn; Heya diho cûdahiyek di navbera mîr û jinan de dihat danîn. Lî wî ev cûdahî jî nepejirand. Cû destê têkoşerên jin jî û mîr jî gîvaşt. Serkevtina wan kire daxwaza dilê xwe. Gava komên şervanen vedigeriyan bakûrê welêt, şîretên wiha li wan dikir ku serlesker û komûtanen hilbijartî jî nikaribin bikin. Hemû nirxandin wî weke direktif û fermandan pîroz bûn. wiha digote şervanen: "Divê hûn baş xwe bi cih bikin. Nimûne, êrdîma ez nas dikim Xerzan e, ez Xerzan baş dizanîm. Ez derdorê Motkî, Hezo (Kozluk), Misric (Kurtalan), Sason, Elîh (Batman), Xizzîr (Perwari) û Farqînê (Silîva) baş nasdikim. Li van deran ji bo bi cih bûnê gund û çiyayen bi nav in... gelekî baş in. Divê hûn van deran baş bigirin û destûr nedîn otorîteya dijminî." Ev tê ci wate yê? Baweriya xwe ya bi têkoşeran re girêdaye, evîna dilê xwe, gelekî baş dide der. Anglo Ew li dijî her babet pasifîzîmê, her cûre reformizmê bû. Bi metodeke şoresserî xwe dabû ser riya cenga rizgariyê, xwe dabû ber bi aliyê doza rizgariyê ve. Digot, "Di misilmaniye de jî dîsîplîn heye, rast bi cih anîna ferman û direktifan heye. Ev tiş di oli de jî pêşveçûye. Komûtan û leşkeren İslamiyetê ci bûn û ci dikirin?" Paşê tişten dizanî rîz dikir. Li gorazanîna xwe, bi zanabûna xwe ya ji oli standibû, vî karê xwe gelek bi berfirehî dikir. Dixwest bide zanîna ku guhdar-kirina pêşengî, bi cih anîna fermandan gelekî pêwîst in. Xwe jî weke eskerekî dihesiband, bilivîn xwe eskere dikir ku ew bi xwe jî di bin fermanê serokatiyê de ye. Bi rastî jî weke neferekî guhdariya fermanan bike, xwe diliwand. Serok digote wî, "Es-kerê sed salî".

We dom bike

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
- Berpîrsiyarê Gişî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpîrsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîsan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 311 57 60-511 66 02
- Fax: 511 51 57 • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ